# Cîyê ‘Eqîdenameyan Di Edebîyata Kurdî û Perwerdehîya Medreseyan de

## The Role of Akidenames in The Kurdish Literature and Their Effect on Madrasa Education

Ayhan YILDIZ*

**PUXTE**

Ji wan berheman re ku ruknên îmanê yên dînê Îslamê ji xwe re kirine mijar ‘eqîdename dihê gotin. Van cure berhemên edebî-dînî, hîna di serdema Sahabîyan de dest pê kiriye û her ku dem bi ser de derbas bûye, wek şaxekî xweser ê zanistên Îslamî ketiye nav geşedanê. Çawa ku ev cure berhem di edebiyata ‘Erebî, Farisî û Tirkî de hatine nivîsîn, ji sedsala XVIIan pê ve, cara ewil bi Ehmedê Xanî (w. 1709) di edebiyata Kurmancî de, bi navê *‘Eqîdeya Îmanê* hatiye nivîsîn. Di pey Xanî re gelek ‘eqîdenameyên menzûm û mensûr, bi terzê mesnewî û qesîdeyan, ji aliyê alimên medreseyên Kurdan ve hatine nivîsîn. Şêx Ebdullahê Şemdînî (w. 1813), Feqe Reşîdê Koçer (ss. XVIII), Muksî (w. 1850), Ebdirehîm Rehmîyê Hekarî (w. 1916), Zoqeydî (w. 1935), Mela Ehmedê Heyderî (w. 1937), Şêx Ehmedê Feqîr (ss. XIX), Xalidê Zengokî (w. 1950), Xelîfe Yûsufê Bayezîdî (w. 1387/1968), Mela Ebdullah (w. 1970), Ebdulfettahê Hezroyî (w. 1975), Şêx Mûsayê Mêrdînî (w. 1992), Mela Mihemed Emînê Heyderî (w. 2003), Mela Mihemedê Hezanî û Comanî (w. 2004), li ser vê nerîtê ‘eqîdename nivîsîne. Çawa ku bi Kurmancî ‘eqîdename hatine nivîsîn, bi Goranî [Mewlewî (w. 1300 koçî)], bi Soranî [Mehwî (w. 1906)] û bi Kirmanckî/Zazakî [Elîyê Hûnî (sala 1970yan) û Mela Mihemedê Hezanî] jî ‘eqîdeyên îmanê hatine nivîsîn.

‘Eqîdenasên Îslamê jî, li hember van teorî û bizavên fikrî yên dijber, hewl daye ‘eqîdeya sehîh a Îslamê biparêzin; lewre wan jî di tanga xwe de, serê ewil bi awayê devkî, peyre bi awayê nivîskî di vî warî de berhem dane. ‘Eqîdenûsên Îslamî, zemanê berê bi zimanê ‘Erebî, peyre, her neteweyî, bi berhemên zimanê xwe li hember kelamnasên Yehûdî, Nesara û Mecûsî ‘eqîdeya sehîh a Îslamî parastiye. Ilmê Kelam ê Ehlê

**Teaching Staff, Department of Kurdish Language and Culture, Mardin Artuklu University, Turkey**

Peywirdarê Hîndekarîyê, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, Turkiye.
e-mail: ayhanmeretowar21@gmail.com

Sunnetê, digel kelamnasên dînên berê, rastî fikrên felsefî yên Rojavayê hatiye û neçar maye li hember wan Bizavên Nû yên Felsefî yên Rojavayê, bi metodên nû ‘eqîdeya Îslamê biparêzin.

**Bêjeyên sereke:** Kelam, ‘Eqîde, Mutezîle, Eş‘erî, Maturîdî, Felsefe, ‘Eqîdenameyên Kurmancî, Soranî, Goranî û Kirmanckî.

**ABSTRACT**

The literary works with the type of akidename in Kurdish literature are widely seen in the literature of theology and they have a history of nearly three centuries. In line with the historical development of the science of Kalam in Islamic literature in Arabic, Persian and Turkish, writing poems on credendum/faith has become a literary tradition. Kurdish madrasah scholars also participated in this tradition by writing works in their mother tongue. Ahmedê Xanî (17th century) is one of the leading ones among those who produce that kind of works. Xanî's poetic work titled Akideya İmanê became an exemplary work for many literary scholars. However, some of the literary scholars have written this type of work in the form of prose. Akidenames handle the topics of the pillars of the faith; the belief to Allah, angels, holy books, prophets, the doomsday, fate and the Judgement Day. In addition to these topics, some akides were also written about the questions of the science of Kalam such as the miracles of the prophets, saints, the punishment of the grave, and the actions of mortals.

In addition to these works written mostly in Kurmanci, there are also some works written in Gorani, Sorani, and Zazaki. It is seen that almost twenty works of this kind are written in the form of poetry and prose in Kurmanci, followed by five akidename in Zazaki, and one in Sorani and Gorani.

The vast majority of the poetic akidenames were written in "masnavi" type of verse, however, some of them were written in the form of qasida.

**Keywords:** Kurmanci, Sorani, Gorani, and Zazaki, Islamic faith, philosophical mobility.

## 1. DESTPÊK

Di nav ilmên Îslamî yên mîna hedîs, tefsîr, fiqih, qiraet û usûlên wan de, ilmê kelam û ‘eqîdeyê, wek ilmekî bingehîn cih digre. Li gor ‘aliman, du qadên ‘eslî yên ilmê Îslamê hene ku yek ji wan, hêla ilmên pratîk; yek jî ilmê îtîqadî ye. Gava muminek, van her du ilman di jîyana xwe de pêk bîne, êdî dibe xwedî "exlaqê xweş". Ev her sê alî, hev temam dikin û yek bêyî yên dî nabe. Digel vê, tehqîqa ilmê ‘eqîdeyê, berî hemû ilmên dî yên Îslamî tê. Çunkî ilmê ‘eqîdeyê, ji alîyê hişê muminan ve erka "teorîyê" pêk tîne; ilmên dî jî, di jîyanê de li gor vê teorîyê dikevin pratîkê.

Hêla dîn a bawerîyê, bi xêra zanîna teorî ya ilmê kelamê dikemile. Heta ku mumin, bi xêra ilmê kelamê, dil û hişê xwe ji alîyê bawerî/îmanê ve têr neke,

nikare emr û nehyên Kitab (Qur’an) û Sunnetê (Hedîs) bîne cih. Çunkî bi xêra ‘eqîdenasîyê, mirovên mumin, bawerîya xwe ya bi Xwedê, melek, kitêb, pêxember, roja axretê, bi qeza û qederê, pêt û zexm dikin.

Rabirdûya rêbaza ‘eqîdeyê, wek şaxekî ‘ilim, digihîje serdema Mutezîle. Digel ku bizaveke kelamî ya Xaricîyan jî hebûye; bes bi qasî ya ‘alimên Mutezîlî bi rêk û pêk nebûye. Ji bilî van, mekteba Kerramîyye û Şî‘a jî di warê vî ilmî de ketine dîrokê. Ji ber ku van ekolan, meyla xwe zêde daye ser felsefeyê, ‘alimên Ehlê Sunnetê li dijberî wan derketine û wan jî ekolên kelamî ku li gor ‘eqîdeya sehîh a Ehlê Sunnetê ye bi pêş xistine. ‘Alimên mîna Ebû’l-Hesen el-Eş‘erî û Îmam Maturîdî, di qada Ehlê Sunetê de bûne damezrînerên ewil ên du mezhebên mezin ên îtîqadî. Di pey wan re ‘alimên ku li ber destê wan û telebeyên wan gihîştine, ev mezhebên ‘eqîdeyî bi pêş xistine û di pey berhemên ‘Erebî û Tirkî re, gelek ‘aliman, bi Kurmancî, Goranî, Soranî û Kirmanckî, heta roja me, li hember fikrên texrîbkar ên dijber, ji bo berevanîya ‘eqîdeya sehîh a Îslamê, çi bi teşeyê nezmî be, çi jî bi awayê pexşankî be, gelek berhem nivîsîne û di medreseyên xwe de dane xwendin.

Vê gotarê, çawa ku berê bal û dêhnê kêşaye ser “dîrokçeya berhemên îtîqadî” yên Îslamî, wisa jî li gor dereceya daneyên berdest, berê xwe daye ser şop û rêça ‘eqîdenameyên Kurmancî, Goranî, Soranî û Kirmanckî. ‘Eqîdenameyên menzûm û mensûr ku xwedî rabirdûyeke zêdetirî sedsalan e, digel teşeyên xwe yên nezmî û naveroka xwe ya kelamî bûne mijara sereke ji vê xebatê re.

## 2. PÊNASEYA ‘EQÎDE Û ILMÊ KELAMÊ

Di dîrokê de navên cihêreng li ilmê ‘eqîdeyê hatine danîn. Ilmê ‘eqîdeyê ku wek ilmekî lêgerîna li hukmên îtîqadî yên şerî‘eta Îslamî û usûla dînî ya kullî ya Îslamî hatîye destnîşankirin, bi navên mîna “ilmê kelam”, “usûlu’d-dîn”, “el-fiqhu’l-ekber”, “ilmu’t-tewhîd”, ilmu’n-nezerî we’l-istidlal û “ilmu’l-‘eqaidi’l-Îslam” (Mehmûd, 2001, r. 9) hatîye binavkirin. Balkêş e ku navê kitêba Îmamê Ezem ku ji ewiltirîn berhemên ‘eqîdeyê ye, *el-Fikhu’l-Ekber* e.

Li gor wateya terîmî, ilmê kelam, ilmê tewhîdê ye ku ilmê şer‘î û hukmî, asas û qaydeyên ‘eqîdeya Îslamê li serê ava bûne. Ev ‘ilim ku bi navê “ilmê sifet” jî hatîye binavkirin, di nav ilmên şer‘î yên mîna tefsîr, hedîs û fiqhê de şaxekî xweser e ku mirovan ji xumamîya şik û gumanan û ji tarîtîyên wehman rizgar dike; lewre bûye pêşewayê ilmên Îslamî (Kestelî, 1310: 6). Ev pênase ku di kitêbên klasîk de hatîye dîyarkirin, tarîfeke xasî bi ‘alimên berê yên ekola Matûrîdî ye ku ji mezhebê Ehlê Sunnetê tê hesibandin. Ji ber ku di warê nikirandina ‘eqîdeyên Kurdî de bi kêrî me tê, pêdivîya me li vê derê bi pênasekirin û ravekirina her yek navekî vî cure ilmî heye.

**2. 1. el-Fiqhu'l-Ekber**

Di dîroka ilmê kelamê de ʿalimê ewil ku ev navê "fiqha ekber", ango "fiqha herî mezin" ji bo vî ilmî bi kar anîye, Ebû Henîfe ye ku di nîvê sedsala duyem a koçî de jîyaye. Çunkî em ji berhema wî ya bi navê *el-Fikhu'l-Ekber* tê derdixin ku wî ev nav, hîna ji wê hingê ve qebûl kirîye û derxistîye pêş.

**2. 2. Kelam**

Li gor nehwîyan/rêzimannasan, ferq di navbera peyvika "kelîme" û "kelam"ê de heye. Kelîme, ji wan bêjeyên/peyvikên mîna îsim, sifet, zerf û cînavên tekûtenê, yan jî ji wan komepeyvikên bêfeyde yên îzafeyên navdêrîn û ravekên rengdêrin re tê gotin ku wateyeke tekûz û temam nadin; bes "kelam" ji koma wan peyvikan re tê gotin ku wate bi wan diqede. Gava em dibêjin "Ehmed", yan jî "Ehmedê dirêj", yan jî "Gava Ehmed rabû," wateyeke temam nade. Lê gava bê gotin "Gava mamoste hat, xwendekar bê deng bûn.", kelam çê dibe (Ebdulhemîd, 2014: 19-20).

Qewl, gotin, peyv, bêje, lefiz, axaftin, nutuq û îbare, gava ku fikrekê, wateyekê, bi awayekî tam û tekûz vebêje, dibe kelam. Di nav vê çarçoveyê de peyv û fermanên Îlahî, bi heman kelîmeyê tên derbirîn. Ji lew re ye ku navekî dî yê *Qur'an*ê, wek *kelamullah*, ango bêjeya Ellahu teala, axaftina wî û xîtabeya wî ya ji bo mirovahîyê (Özler, 2014: 3) hatîye pênasekirin. Kelam, ji alîyê ferhengî ve li cem rêzimannasan, ji vê hevokê îbaret e: "Ji wî lefzê bifeyde pêk tê ku rawestîna li serê, têr dike û xweş e" (ʿEqîl, 1432/2015: 21). Wateya ferhengî ya bêjeya "kelam"ê, "gotin" e. Ji hêla terîmî ve kelam, navê wî ilmî ye ku li ser hebûna Xwedê û rastîya dînê Îslamê disekine (Farqînî, 2000).

**2. 3. Usûlu'd-Dîn**

Kelîmeya "usûl" li gor rêzimanîyê, pirjimarîya kelîmeya "esil" e. Wateya ferhengî ya vê peyvika "esil" jî ew e ku tişt, li serê ava dibin. Ev nav, di qernê duyem ê koçî de ji bo ilmê kelamê hatîye bikaranîn. Piştî vî awayî, wateya kelîmeya "esil" di ʿurfê de neqlî wateya "delîl" bûye. Mesela tê gotin ku eslê vê meseleyê *Qur'an* e. Dîsa di qaydeyên kullî de tê gotin ku mirar/meytet, ji bo kesên ku di zerûretê de ne, helal e. A ku ji bo vê kelîmeyê di kelamê de tê tercîhkirin esil, "heqîqet" e. Wisa dîyar dibe ku mebest ji "usûl"ê, di ʿurfê de du wate ne: Çawa ku Teftazanî di *Şerhu'l-Meqasid*ê de dibêje, ev ʿilim, ew e ku mirov bi qaydeyên şerʿî yên îtîqadî bizanibe ku ew jî, delîlên wê yên yeqînî, pê tên derxistin. Ev ku heye, tê wateya ʿeqîdeyên dînî. Îcar ev navlêkirin, ji qedîmî zeman ve di nav ʿalimên Îslamê de heye ku wekî nav, li berhemên xwe datînin. Tê bawerkirin ku di rabirdûya vî navê "ilmu usûli'd-dîn", diçe digihîje qernê duyem ê koçî. Çunkî ʿalimên wê serdemê, hîna wê hingê ilmên şerʿî dabeşî du sernavan kirine: "Usûl" û "furû'". Hetta Ebû'l-Hesen el-Eşʿerî (w. 324/936) bi xwe,

navê *el-Îbanetu ‘en Usûli'd-Dîyane* li berhema xwe danîye. Ebdulqahir el-Bexdadî (w. 429k.) navê kitêba xwe danîye *Usûlu'd-Dîn* (Mehmûd, 2001: 24-25).

**2. 4. Îman**

Di serdema Cenabê Nebî de, dema ku Ruhu'l-Emîn di sûretê însên de nazilî cem Resûlellah bûye û jê pirsîye bê ka îman çi ye, Nebî wiha cewaba wî daye: “Îman, ew e ku tu bi Ellah, melek, kitêb û resûlên wî bawer bikî, bi Roja Axir bawer bikî, bi qeder, xêr û şerrê wî bawer bikî (Muslim, 37/1; Buxarî, 1793/4). Bi tarîfeke dî îman, tesdîqa teblîxa Nebî ye ku ji cem Ellahu teala hatine û iqrara bi wan e (Nesefî, 1315: 8). Li gor Tehawî îman, iqrara bi ziman û tesdîqa bi dil e. Ji van pênaseyan dîyar e ku mijarên ilmê kelam û ‘eqîdeya îmanê, digel hev in.

**2. 5. Ilmu'z-Zat we's-Sifat**

Bikaranîna vî navî ji bo ilmê kelamê, di *Şerhu'l-‘Eqaidi'n-Nesefîyye* de tê dîtin. Ji ber ku kelam behsa zatê Îlahî û sifatên ku têkildarî zatê wî ne dike û behsa fiîlê Îlahî dike, ev nav hatîye bikaranîn. Lewre di nav mijaran de çawa ku girîngtirîn mijar sifatên Îlahî ne, di nav ilman de jî girîngtirîn ‘ilim, “ilmê tewhîd û sifatan” e (Mehmûd, 2001: 26).

**2. 6. Ilmu't-Tewhîd**

Kelîmeya “tewhîd”ê, di heqîqetê de, ne tenê sifateke Îlahî ye; bes ew şî‘areke milletê Îslamê ye. Bîrûnî dîyar dike ku tewhîd, sifeteke wisa ye ku di nav “dîn” û dunyayê de Îslam pê tê naskirin. Ne xelet e ku ilmê ‘eqaida Îslamî ji vê bihê girtin, yan jî hedefa meqsedkirî, ji tehsîl û talîma ‘eqaidê, tewhîd be. Huseyin Walî ku kelamnasekî hemdem e, dibêje ku navê vî ilmî, ilmê tewhîdê ye; çunkî wehdanîyeta Ellah, navdartirîn mijar û bişereftirîn beşa wê ye (Mehmûd, 2001: 26). Ilmê tewhîdê ku ilmê ‘eqîdeyê ye, girîngtirîn û mezintirînê ilman e û ji hêla huqûqî/fiqhî ve hînbûna wê, zerûrî ye (Receb, 1994/1414: 1).

**2. 7. Ilmu'n-Nezeri we'l-Îstidlal**

Çawa ku Teftazanî (w. 791k.) di muqedimeya *Şerhu'l-‘Eqaidi'n-Nesefîyye* de behs dike, “nezer” ji bo gihîştina daxwaz û darazên ku nahên zanîn, fikirîna li ser tiştan, ango di zihnê de tertîbkirina agahî û zanînên berê ye. Lewre ev unwan, bûye xasê bi destpêka kitêbên qedîm ên ilmê kelamê. Çunkî ev ‘ilim, bi xêra tehsîl û talîma delîl û burhanan tê berfirehkirin (Mehmûd, 2001: 27).

**2. 8. Ilmu'l-‘Eqaid**

Li gor wateya ferhengê kelimeya “‘eqîde”yê û ji koka kelîmeya “‘eqede”yê hatîye û hatina berbihev a terefên tiştekî ye. Peyre ev kelîme, ji bo tiştên cismî/şênber hatîye bikaranîn. Wek ‘eqda ben û avahîyê. Di pey van bikaranînan de, ji bo wateyên mîna ‘eqda bî‘ê/danûstendinê û ‘ehdê hatîye dîyarkirin. Peyre ji bo ‘eqda nîkeh û

sondan jî hatîye bikaranîn (el-Isfehanî, 2005/1426: 344). Koka kelîmeya "'eqîde"yê, *'eqd* e, pirjimarîya wê *'eqaid* e. 'Eqîde, ji wê bawerîyê re tê gotin ku meqsed pê dîn e, ne 'emel e (Huseyn, 2012/1434).

Ev navê 'eqîdeyê, ji navên berî xwe nûtir e. Tê texmînkirin ku di qernê çaran ê koçî de ji bo ilmê kelamê hatîye bikaranîn. *'Eqaid* ku cem'a/pirjimarîya *'eqîde*yê ye, li ser wezna "fe'îl" e û bi wateya "mef'ûl" e ku tê wateya pêbawerkirinên dînî. Mebest û amanc bi vî ilmî, ew qayde û hukmên şer'î yên îtîqadî ne ku ji mukellefan tê xwestin û bi vî awayî ew bi sehîhî û rastîtîya hukmên şer'î bawer bikin (Mehmûd, 2001: 25).

Piranîya alimên zemanê berê, ji bo ilmê kelamê, ev nav bi kar anîne. Wek mînak, mirov dikare navê berhema *'Eqîdetu't-Tehawî* ya Tehawî (w. 330k.), *el-'Eqîdetu'l-Wasitîyye*ya Îbn Teymîyye (w. 728k.), *el-'Eqaidu'l-'Edudîyye* ya el-Îcî, *Tecrîdu'l-Îtîqad*a Nesîreddîn et-Tûsî (w. 671k.) û *Qewaidu'l-'Eqaid*a Xezzalî (w. 505) bide.

Çanda 'eqîdeyê ku bi awayê 'eqîde, îtîqad, îman, 'eqîdeya saxlem, 'eqîdeya xerabûyî di jîyana bawerîyê de cih girtîye, navê wê nêrîn û destûrê ye ku ketîye delavê bawerîyê. Ji hêla felsefeyê ve 'eqîde, navê qebûlkirina awayekî bawerîyekê ye. Wek bawermendên 'eqîdeya Sunnîyan. Di zemanê Osmanîyan de rê û resmeke fermî hebû ku jê re "merasîma 'eqîdeyê" dihat gotin ku tê de *ulûfe* li Yeniçerîyan dihat belavkirin û şekir, ji wezîrêezem û axayên ocaxê re dihat îkramkirin (*Larousse Ansiklopedi*, 1986, r. 274).

Li gor ku di çand û zimanê Kurdî de cîyê xwe girtîye, "wateya 'eqîde"yê rê, rêbaz, teher û terzê bawerîya bi dînî ye. Di nav gelê Kurd de, gava yekî/yeke muslim, bi her tiştê dîn bawer bike; lê belê di hin cîyên 'eqîdeyê de bikeve şik û gumanan, yan jî di hêla bawerîyê de hin tiştan rexne bike, tafilê pîr û kalên dîndar, jê re dibêjin: "*'eqîdeya wî/wê xera bûye.*" Jixwe serê sed salan e ku di medreseyên welatê Kurdan de, ji bo wan berhemên ku li ser îmanê ne, *'eqîdeya îmanê* tê gotin. Navlêkirina bi vî awayî, wisa dîyar e ku di nav alimên Kurd de bûye nerît û şopajoyeke ilmî. Di pey Xanî re piranîya 'eqîdenûsên Kurmanc, Soran û Kirmanc/Zaza, ev nav li kitêbên xwe yên kelamê danîye. Êdî navê "'eqîdename" îro wek navekî wan berheman hatîye qebûlkirin ku bi awayê nezmî yan jî pexşanî, li ser mijarên ilmê kelamê disekinin.

Her wuha, di nav gel de cureyekî şekir ê rengo rengo bi navê "şekirê 'eqîdê" heye ku ji helawîya "aqit"ê ango "dims"ê tê çêkirin, bi bêhneke xweş e û di devê mirovan de zû bi zû nahele (Farqînî, 2000). Wisa dîyar e ku navê tehma şîrîn a şekir û 'eqîdeya sehîh a muminan, di çanda gelêrî de têkil hev bûye.

## 3. GIRÎNGÎYA ILMÊ ‘EQÎDEYÊ

Ilmê kelamê ku mijarên navdartir û meqsedên şerefyabtir in, wek behseke zanistî, di serdema ewil a sehabîyan de çê bûye. Sehabî ku bi bereketa sohbeta Nebewî gihîştine asta xweşî û geşîya ‘eqîdeyê, di pey xwe re wan, nifşa tabîînan jî baş gihîştandîye. Ji ber ku di serdema wan de pirsgirêkên ‘eqîdeyî derneketine, muşkileyên kelamî jî nehatine dîtin (Kestelî, 1315: 11).

Di bawerîyeke tehqîqî de zanîna bi ruknên îmanê, gelek zêde girîng e. Ji bo dîyarkirina vê girîngîyê, hin ji ‘alimên serdema me, îro jî ilmê ‘eqîdeyê, bi *fiqhu’l-ekber* bi nav dikin û dîyar dikin ku dem, ew dem e ku mirovên mumin, bi asasên îmanî re, ku *fiqhu’l-ekber* e, meşxûl bibin; çunkî berê zihna me, a nuha nikare bi awayekî ciddî, bi alî kitekitîyên wan meseleyên kûr ên fer’î ve xwar bibe ku ew medarîk û cîderkên ehlê îctîhadê ne. Hem jixwe alimên Îslamê, tedqîq û lêkolînên wisa xweş biîsabet kirine ku êdî pêdivîya wan, bi lêkolînên kûr ên derbareyê hukum û mu‘emeleyên furûatê de nemaye (Nûrsî, 2002: 105).

## 4. MIJARA ‘EQÎDENAMEYAN

Li cem alimên muteqeddimîn mijara ilmê kelamê, zatê Ellah teala ye, peyre bi rêya xebara sadiq, ji hêla *Sem‘îyat*ê ve zatê Resûlên wî ne; lêbelê piştre mijarên ilmê kelamê, li ser destê ‘eqîdezanên muteexxirîn, bi mijar û meseleyên felsefe û hikmetê re ketîye nav hev. Bi vî awayî mewcûdat, ji hêla wucûdê ve bûne mijara vî ilmî û hewl hatîye dayîn ‘eqîdeyên dînî, pê bihên peyitandin. Delîlîya hebûna mewcûdan, li ser sifatên Îlahî û li ser fiîlên wî yên hekîm hatine şîrovekirin (Xezzalî, 2009/1430: 33-34).

Berhemên ‘eqîdeyî, bi giştî *ruknên îmanê* ji xwe re dikin mijar; bes di hin ‘eqîdenameyan de *ruknên Îslamê* jî bûne mijar. Bi derbasbûna demê re hukmên fiqhî yên derbareyê bawerîya sehîh û ‘eqîdeya heqîqî de jî ketine nav mijarên van cure berheman. Awa û qaydeyên ‘eqîdeya Îslamî, wek prensîb, ji alîyê ‘alimên ilmê ‘eqîdeyê ve, di ‘eqîdenameyan de hatine destnîşankirin.

## 5. HUKMÊ MEŞXULBÛNA BI ILMÊ KELAM Û ‘EQÎDEYÊ

Ilmê kelamê, ilmekî şer‘î ye ku meqsed pê, tehsîlkirina hukmên îtîqadî yên şerî‘eta Îslamî ye. Ev ku heye, amanceke mezin û muteber e. Digel vê, ji bo îstiqameta vî ilmî, helqeyên hevgirtî hene, “pevçûn û tevdana nêrînan” û tedwîna/berhevkirina kitêban di medenîyeta Îslamê de çê bûye. Di vê rêyê de mezhebên ku dûrî hev û nêzî hev in derketine; lê dîsa jî cewherê ‘eqîdeya Îslamê, bi awayê ku ji *Kitab* û *Sunnet*ê warid bûye, safî maye. Aliman, uslûbên delîlanînê, di rêbazên xwe de cîya cîya bi kar anîne, usûla nêrîna wan a Îslamî ku pê ji *Qur’an*ê delîl derxistine,

ne mîna hev bûne. Ev cîyabûna navbera nêrînên wan, wisa bûye ku êdî gihîştîye heddê derketina ji milletîya Îslamê. Çunkî hinek ji aliman, rêbazên Rojavayî yên felsefeyê, di vî ilmî de bi kar anîne û ji ber vî awayî, îştixala bi ilmê kelamê, wextekî "ne meşrû" hatîye dîtin û hinek alim, jê bi dûr ketine; hinekan di kitêbên xwe de dîyar kirîye ku têkildarîya bi vî ilmî "heram" e, hinekan jî di helqeyên xwe yên ilmî de cih nedaye ilmê kelamê. Digel van îxtilafên navbera wan ku di dirêjîya qernan de qewimîne, alimên kelamparêz, cewaza îştixala pê, bi awayê şer'î daye û ji van aliman, ên ku ev daraza/hukmê şer'î di dereceya *ferzulkifaye* de dîtîye hene. Heta hinek ji aliman, hukmê *ferzuleyn* jî daye ku divê mumin pê eleqedar bibin. Îmamê Heremeyn el-Helîmî, Beyheqî, Xezzalî, Newewî û Îbn 'Esakir, ji wan aliman in ku wan, îştixala bi ilmê kelamê, wekî hukmekî *ferzuleyn* qebûl kirîye (Mehmûd, 2001: 30-31). Dibe ku ji ber vê egerê, alimên Kurmanc, Soran, Goran û Kird/Kirmanc wisa zêde pêdivî bi nivîsîna van cure berheman dîtibin. Çunkî di sedsala XVIIan de gelek fikrên felsefî yên nû yên mîna Pozîtîvizm, Darwînîzm û Materyalîzmê, ji Rojavayê ketine nava muminan û wan zêde zor daye 'eqîdeya sehîh a îmana muminên muslim û nemuslim. Li hember van tehdîdan, hewldana berevanî ya 'eqîdeya îmanê, di nav alimên Kurd de wek berpirsîyarîyeke dînî hatîye qebûlkirin û ji ber vê, ew jî ketine nav liv û tevgera fikrî û wan ev çend 'eqîdenameyên qedirbilind nivîsîne.

### 6. AMANCA ILMÊ 'EQÎDEYÊ

Amanca sereke ya ilmê 'eqîdeyê ew e ku bawerîya teqlîdî ya muminên muqellid, ji tarîtîya teqlîdîyê derxîne dereceya nûra yeqînîyê û bi ser de jî, 'eqîdeya muminên muqellid bi rêya irşadê ji şik û gumanên batil biparêze. Bi vî awayî mebesta ilmê kelamê ew e ku dawîya dawî, muminan bigihîjîne seadeta dara dunya û axretê (Xerpûtî, ragihîner: Qeredaş, 2015: 9).

### 7. MIFA Û FÊKÎYÊN ILMÊ 'EQÎDEYÊ

Gava bi mirovê/a muslim re hêz û behreya peyitîna 'eqîdeyê hebe, dikare li hember bid'ekar û kesên xurufî yên mezhebên batil ku ketine dalaletê, bi vîn û şîyana delîlan tê bikoşe û bi besîreteke/çavnasîyeke xweş, wan ber bi [hidayeta] Ellahu teala ve vexwîne. Ev ku heye, wezîfeyeke şerîf û mertebeyeke nefîs e ji bo merivan. Çunkî meriv bi vî awayî û bi vê zanetîyê, digihîje xêra mewqifî yên mîna kesên pêxember, salih û hwd. Lewre Xwedê teala gotîye: "Bibêje ku ha ev, rêya min e, ez ber bi Ellah ve vedixwînim, ez û yên ku dibin tabi'ê min, li ser besîretê ne. Subhanellah û ez ne ji muşrikan im (Yûsuf: 108). Çawa ku di pişt her amancekê de gihîştina seadeta dunya û ebedîyetê, wek encameke tebîî heye, di hasilkirina îtîqadên heq û

tesewwurên pey wan de jî, ev heye ku mirov, bi xêra wan xwe ji xurufînê diparêze. Lûtkeya van îtîqadên heq û dawîya/encama wan jî Heqq e (Xezzalî, 2009/1430: 36). Çawa ku Ellah di kitêba Îlahî de dibêje: “Bê guman dawîya dawî, her kes bi bal Rebbê te ve vedigere.” (Necm: 42).

## 8. DÎROKA EKOL Û FIRQEYÊN ILMÊ KELAM Û ‘EQÎDEYÊ

### 8. 1. Bizavên ‘Eqîdeyî yên Serdema Sehabîyan

Dema ku felsefe li zimanê Erebî hat wergerandin, hizirînerên Îslamê jî pê de ketin. Di wê keş û seqayê de aliman, hewil da li hember wan fikir û nêrînên ku dijberî şerîetê bûn, *reddîye*yan binivîsin. Bi vî awayî gelek rêbaz ji zanista felsefeyê jî ketin nava ilmê kelam û ‘eqîdeyê. Çunkî aliman dixwest ku merem û meqsedên xwe pê bigihîjin encamê (Kestelî, 1315: 17). Li gor van agahîyan, meriv dikare dîroka firqeyên ilmê kelamê, bi vê “tevgera fikrî” bide destpêkirin ku destpêka dîroka wergerandina felsefeyê li zimanê Erebî, di serdema Xelîfeyê Ebbasî Me’mûn (w. 218k.) de ye (Bek, ?: 179).

Di serdema Cenabê Nebî de têkoşîna ‘eqîdeyî ya muminan, li hember sê dijberan bûye: “Muşrikên Ereb”, “kelamnasên Yehûdî” û “kelamnasên Nesara”. Di navbera wan û Hz. Pêxember de munazereyên ‘eqîdeyî çê bûne. Di serdema xelîfeyên raşid de, bi ser dînên qedîm û berê de, teologên dînê Mecûsîtî û dijberên dî lê zêde bûne. Digel ku Hz. Pêxember di serdema xwe de ji milûkên wan re nema şandibûn û ew vexwendibûn ‘eqîdeya Îslamê; ew di serdema Xelîfe ‘Umer b. Xettab de hîn bêhtir ketin nav muminan û têkoşîna navbera van ‘eqîdeyan her ku çû, zêdetir bû. Di pey xelîfeyên raşid de nifş bi nifş, vê nakokî û têkoşîna navbera ‘eqîdeya Îslamê û fikrên dijberî Îslamê heta roja me, bi awayên cihêreng, her berdewam kirîye. ‘Eqîdeparêzên Îslamî, li hember ideolojîyên dijber, bi awayên curbicur, her di karê berxwedana fikrî û edebî de bûne. Çawa ku her yek ji alimên mumin û edîb ên Ereb, Tirk, Efxan û Faris, bi zimanê xwe, berhemên ‘eqîdeyî/kelamî, di vê rêyê de ji bo gelê xwe nivîsîne, Kurdên mumin ên alim jî, di vê rewşê de li haşê ranewestîyane û alimên wan ên medreseyan, di warê ilmê kelamê de berhemên ‘eqîdeya îman û Îslamê, bi rêya “edebîyat”ê dane. Fikra ‘eqîdeya sehîh a *Ehlê Sunnet û Cemaetê*, bi xêra ‘eqîdenameyên Kurmancî, Goranî, Soranî û Kirmanckî li ser destê feqîh û melayên edîb ên medreseyan gihîştîye civakê.

Li gor çavkanîyên dîroka Îslamê (Karadaş, 2015), di serdema Emewîyan de ku rastî qernê yekem ê koçî tê, *felsefeya Grekî* bi xêra alimên kelamnas ên Suryanî li zimanê Erebî hatîye wergerandin. Ji wê hingê heta îro, di nav musliman de fikrên felsefî di rewacê de mane. Kesên ku bawerî bi van fikran anîye, her carê bi terzekî fikrî yê serdema xwe zor daye ‘eqîdeya sehîh a Îslamê. Li hember van êrîşên texrîbkar,

alimên Îslamê jî, li her alîyê alema Îslamê, bi terz û rêbazên nû, berevanîya ʿeqîdeya Îslamê kirîye. Alimên Kurd ên medreseyan jî, di wextê xwe de ku medrese şên bûne, di nav xwe de bi rêya berhemên xwe yên edebî, li hember van cure fikrên dijberî Îslamê xwe ragirtîye. wisa dixuye ku dê heta û hetayê ev têkoşîna hunerî-edebî, li hemberî teorî û bizavên cihêreng yên felsefî, her berdewam bike. Li vê derê, ji ber sînorê şamilîya gotarê, tenê ji ekola *Mutezîle* û *Eşʿerî* re cih hatîye dayîn.

**8. 2. Bizava Ekola Mutezîlîyan**

Wasil b. Ata (w. 131/748) ku ji helqeya dersê ya Hesenê Besrî (w. 110/728) veqetîyaye, digel ʿEmr b. ʿUbeyd (w. 144/761) bûye pêşengê ekola ewil a kelamî. Di serdema pêşî ya Ebbasîyan de hin alim li pey Wasil b. Ata çûne û bi vî awayî "Firqeya Mutezîle" derketîye. Lê peyre Dirar b. ʿEmr (w. 200/815) ji Ekola Mutezîlîyan veqetîyaye û li ser "Ekola Eşʿeri"yan karîger bûye û Şehristanî (w. 548/1153) ew ji "Ekola Cebrîyye" hesibandîye (Karadaş, 2015: 63-64).

Alimên dîroka kelamê, ji firqeyên kelamê re "Mezhebên Îtîqadî" jî dibêjin. Li gor vî navî, dîyar e ku mirov dikare wan wisa bihesibîne ku di bin banê ʿeqîdeya eslî ya Îslamê de, di dirêjahîya dîrokê de, kevneşopîya ʿeqîdeyê bi awayê tedrîcî, hîna berî mezhebên îbadetê çê bûye. Firqeyên mîna "Xaricî", "Şîʿe" û "Murcie" jî di dîroka kelamê de, digel Mektebên Kelamî yên Ehlê Sunnetê derketine ku ew "Eşʿerî" û "Maturîdî" ne. Ji ber ku mijara vê gotarê, ʿeqîdenameyên Kurdî ne û piranîya van ʿeqîdenameyan jî li ser şopa "Mekteba Eşʿerî" ye, cîyekî berfireh dê ji vê ekolê re bihê veqetandin.

**8. 2. Bizava Ekola Eşʿerîyan**

Ekola Eşʿerî, di dawîya qernê sêyem ê koçî de, bi Ebû'l-Hesen el-Eşʿerî (w. 324/936) ku veqetîna xwe ya ji Mutezîlîyan da xuyakirin û beşdarîya xwe ya bi Ehlê Hedîsê re da dîyarkirin dest pê kirîye. Bi vî awayî wî ji xwe re di rêya marîfetê de, da ser şêwaza weset û îtîdala navbera *wehîy* û *aqilî*. Alimên ilmê kelam, dîroka Mezhebê ʿEqîdeyî ya Eşʿerî, li du merheleyan daye dabeşkirin: Merheleya "muteqeddimîn" û merheleya "muteexxirîn". Merheleya ewil, bi Ebû'l-Hesen el-Eşʿerî (w. 324/936) ku damezrîner e dest pê dike, heta Îmamu'l-Heremeyn el-Cuweynî (w. 478/1085) dewam dike. Merheleya muteexxirîn, bi Îmam Xezzalî (w. 505/1111) dest pê dike, heta Serdema Hemdem dewam dike. Alimên navdar ên merheleya ewil, telebeyên Eşʿerî, Ebû Bekir Baqillanî (w. 403/1013), Ebû Bekir Îbn Furek (w. 406/1015), Ebû Îshaq el-Îsferayinî (w. 418/1027), Ebduqahir el-Bexdadî (w. 429/1037) û Îmamu'l-Heremeyn el-Cuweynî (w. 478/1085) ye. Alimên navdar ên merheleya duduyan, Ebû Hamid el-Xezzalî (w. 505/1111), Fexreddîn er-Razî (w. 606/1209), Seyfeddîn el-Amidî (w. 631/1233), ʿEdududdîn el-Îcî (w. 756/1355), Sadeddîn et-Teftazanî (w. 792/1390), Seyyîd Şerîf el-Curcanî (w. 816/1413), Ali Kuşçu (w. 879/1474) û

Hocazade (w. 893/1488) ye (Qeredaş, 2015: 32). Meriv dikare alimên Kurmanc, Soran, Goran û Kirmanc di nav koma alimên nû yên vê ekolê de bihesibîne.

Ebû’l-Hesen el-Eşʿerî (w. 324/936), dema ku Mutezîlî bûye, nêzî çil berhemî nivîsîne; bes ji wan tu berhemeke wî negihîştîye serdema me. Hejmara berhemên wî, li derdora 200î ye. Ji van, çendên ku wî di wexta xwe ya Ehlê Sunnetê de nivîsîne û gihîştine roja me, ev in (Gölcük, 2012: 73-74):

- *Meqalatu’l-Îslamîyyûn*: Bi awayekî bêlayen behsa firqeyên Îslamî dike. Meseleyên îxtilafî yên kelamê radixe.

- *el-Îbane ʿen Usûli’d-Dîyane*: Di destpêka wê de pesnê Îmam Ehmed b. Henbel dide û peyre behsa meseleyên mîna kelamullah, ru’yet, sifatên Îlahî, ecel, riziq, qeder, şefaet, ezabê qebrê û îmametê dike. Ev berhem, li zimanê Ingilîzî, Frensî û Elmanî hatîye wergerandin.

- *Risale fî Îstihsani’l-Hewd fî’l-Kelam*: Eşʿerî, di vê risaleyê de berevanîya nezer û îstidlalê dike. Çend çapên wê yên cîya cîya hene.

- *el-Lume’ fî’r-Reddi ʿela Ehli’z-Zeyx we’l-Bidʿe*: Îmam, bi delîlên neqlî û eqlî, behsa mijarên kelamullah, îrade, qeder, ru’yet, we’d-weʿîd û îmametê dike. Ev berhem jî li zimanên cihêreng ên dunyayê hatîye wergerandin.

- *Risaletu’l-Îmam*: Ev kitêb li zimanê Elmanî hatîye wergerandin.

Di pey Eşʿerî re Quşeyrî (w. 465/1072) ku muellifê berhema tesewwufî *er-Risale* ye, di kelamê vê ekolê de bûye karîger û wî meyla mezhebê Eşʿerî daye ser tesewwufê. Piştî wî, Celaleddîn Dewwanî (w. 918/1512) ev meyl zêdetir kirîye û fikra “wehdetu’l-wucûd” a Muhyiddîn Îbn ‘Erebî tev li hizra kelamî ya ekola Eşʿerî kirîye (Erdemci, 2014: 99).

## 9. DÎROKA ‘ALIM Û BERHEMÊN ILMÊ KELAM Û ‘EQÎDEYÊ

Bi awayê ku C. Qeredaş di muqeddimeya *el-Muxteser fî Tarîxi ilmi’l-Kelam* de dîyar dike, di “dîroka Îslamê” de rabirdûya ilmê kelêm, digihîje hezar û çar sed salî. Heta gava ku em ji alîyê dîroka pêxemaberan ve li dîroka vî ilmî binêrin, îcar diçe digihîje serdema pêxemberê ewil Hz. Adem. Çunkî peywira hemû pêxemberan/ peyamhinêran ew bûye ku li hember dînên batil/xurufî, berevanîya bawerîya dînê heq bikin (Qeredaş, 2015: 7). Ji ber ku ev têkoşîna navbera bawerîyên batil û bawerîyên heq, ji serdema zaroyên ewil ên Adem heta îro berdewam dike, dîyar e ku heta dunya ava be, çawa ku imtihana bawerîya rast dewam dike, wê ev jî her berdewam bike.

Ku fitneyên sîyasî di nav muminan de derdikevin, ferq û meyl dikeve nav fikir û nêrînên aliman, êdî ew jî dest bi nivîsîna nêrînên ʿeqîdeyî yên kelamnasan dikin. Ji bo parastina nêrînên xwe, her alimê vê hêlê, zor daye destnîşankirina delîlan. Bi

vî awayî alimên ilmê ʿeqîdeyê, ictihad û istinbat li ser qayde û usûlên meseleyên ʿeqîdeyî kirine û bi xêra vê liv û tevgera fikrî ya lêgerîn û lêkolînan, mijar û beşên ilmê kelam ji hev zelal bûne; terîm û têgihên wê di nav mezheban de dîyar bûne (Kestelî, 1315: 12).

Di sedsala IIyan a hicrî de ku rastî sedsala VIIIan miladî tê, ilmê kelêm û ʿeqîdeyê, ketîye merheleya çêbûnê. Îcar wek şaxekî ilmî, ilmê ʿeqîdeyê, di sedsala IVan a hicrî de ku rastî sedsala Xan a miladî tê derketîye. Piştî vê merheleya ewil, êdî bi dorê, serdemên wê yên dîrokî, bi van navan hatine dabeşkirin: Serdema Muteqeddimîn (V/XI), serdema Muteexxirîn (VI/XII), serdema Şerhan (VIII/XIII) û serdema Nû (XIX).

Piştî serdema Cenabê Pêxember (571-632), ilmê kelam, li gor çavkanîyên dîrokî, di serdema sehabîyan de, bi hin xebatan dest pê kirîye. Hesenê Besrî (w. 110/728) ku li ser pirseke Xelîfeyê Emewî Ebdulmelik, bi nameyeke bi navê *Risale fî'l-Qeder* bersiv daye û nêrînên xwe yên derbareyê "fiîlên/kirinên ʿebdan" de nivîsîne û rexne li bawerîya "qederparêzên Cebrî" girtîye, wek berhemeke ilmê kelamê hatîye qebûlkirin. Wekî dî, du *Risale* hene ku nisbeta wan bi Hesen b. Muhemmed Îbnu'l-Henefîyye (w. 100/718) ve tê kirin. *Risale*ya ewil, li ser hukmên derbareyê *Herba Cemel* û *Herba Siffînê* de ye. Wî, di vê nameya bi navê *Kitabu'l-Irca* de ev yek dîyar kirîye: "Ne caiz e ku meriv wan kesên ku beşdarî van herbên navbihurî bûne, bi kufrê tawanbar bike. A baş ew e ku hukmê li ser wan, li benda hukmê Îlahî bihête hiştin."

Nameya dî, risaleyek e ku tê de bersiva pirsên ehlê înkarkirox ê qederê daye (Kılavuz, 2014: 159). Nexwe rasttirîn nêrîn ew e ku ilmê kelamê, wek berhem, bi Hesenê Besrî dest pê kirîye û ewiltirîn berhem jî berhema wî ya bi navê *Risale fî'l-Qeder* e.

Ebû Henîfe Numan b. Sabit (80-150/699) ku sala 80yî ya hicrî, li bajarê Kûfeyê hatîye dunyayê û sala 150 ya hicrî/koçî, li bajarê Bexdadê çûye rehmetê, îmamê mezhebê Henîfî ye û muctehîdekî mezin e. Çawa ku ew di ilmê fiqhê de pêşewa ye, bi ilmê kelamê re jî têkildar bûye û wî di vî warî de jî berhem daye. Wê hingê navê ilmê Kelamê, *ʿeqîde* ye. Ebû Henîfe, bi navê *Fiqhu'l-Ekber*, berhemeke navdar di vî şaxê vî ilmî de daye (Güneş, 2014: 56).

Alimê navdar ê ʿeqîdeya Eşʿerîyan, Ebû'l-Hesen el-Eşʿerî (w. 324/936) ku çil salî di nav alimên Mutezîlî de maye û peyre ji wan veqetîyaye, ketîye nav kelamnasên Ehlê Sunnetê û serê ewil girêdayî îtîqada Ehmed b. Henbel bûye, bi navê *el-Îbane ʿen Usûli'd-Dîyane* û *Risale fî Îstihsanu'l-Hewd fî Îlmi'l-Kelam* berhemên kelamî telîf kirine (Erdemci, 2014: 97). Ebû Muʿîn el-Matûrîdî (w. 333/794), bi navê *Kitabu't-Tewhîd* û *Tewîlatu'l-Qur'an*, berhemên kelamî dane (Ji bo berfirehîya agahîyên Matûrîdî bnr. Erdemci, 2014: 93).

Ebû Ce’fer et-Tehawî (w. 321/933), li ser şopa Selefan, bi navê *el-’Eqîdetu’l-Tehawîyye* berhemeke kelamî daye. Li ser vê ‘eqîdeya Tehawî, gelek aliman kitêbên şerhî telîf kirine ku yek ji wan, Îsmaîl bin Îbrahîm bin Ehmed eş-Şeybanî ye (Hesîn, 1434: 6). Hesen b. Elî el-Berbeharî (w. 329/940), li ser rêça Henbelîyan, berhema xwe ya ‘eqîdeya bi navê *Şerhu Kitabi’s-Sunne* telîf kirîye. Di serdema Muteqeddimîn de kelamparêzê Eş‘erî, Ebû Bekir el-Baqillanî (w. 403/1013), bi navê *Kitabu’t-Temhîd* û peyre jî yek bi navê *Î’cazu’l-Qur’an* û yek jî *el-Beyan* berhemên kelamî nivîsîne. Ebû Ebdullah Îbn Mende (w. 395/1005) ku dijberê ilmê kelamê ye, bi navê *Kitabu’l-Îman*, *Kitabu’t-Tewhîd* û *er-Red ‘ele’l-Cehmîye*, berhem dane. Hace Ebdullah Herewî (w. 481/1089), bi berhema xwe ya *Zemmu’l-Kelam we Ehlihi*, rexne li ehlê kelamê girtîye. Wek şexsîyeteke xweser, Îbn Hezm (w. 456/1064), li ser dîroka dîn û mezheban, berhema bi navê *el-Fesl fî’l-Milel we’l-Ehwa we’n-Nihal*, nivîsîye û ramanên xwe yên îtîqadî raxistine (Kılavuz, 2014: 163-165).

Di serdema Muteexxirîn de alimê ewil ê ilmê kelamê Xezzalî (w. 505/1111) ye. Wî, bi navê *Meqasidu’l-Felasife* û *Tehafutu’l-Felasife* berhem nivîsîne û fîlozaf rexne kirine. Pê re jî, wî bi awayekî rêkûpêk, nêrînên xwe yên kelamî di *el-Îqtisad*ê de daye der. Xezzalî, bi berhema xwe ya kelamî ku navê wê *Qewaidu’l-Eqaid* e, qeydeyên ilmê ‘eqîdeyê derbirîne (Xezzalî, 1405/1985).

Ebû’l-Mu‘în en-Nesefî (w. 508/1115), bi navê *Tebsiretu’l-Edille fî Usûli’d-Dîn*, berhemeke kelamî nivîsîye. Necmedddîn ‘Umer en-Nesefî (w. 537/1142) risaleyeke bi navê *el-Eqaid* daye û tê de meseleyên îtîqadî îfade kirine. Ji fikra Henbelîyan Ebû’l-Ferec Îbnu’l-Cewzî (w. 597/1201), bi navê *Def‘u Şubheti’t-Teşbih* berhemeke ‘eqîdeyê telîf kirîye. Di sedsala VII’an a Hicrî de Fexredîn Razî (w. 606/1210), berhemeke kelamê bi navê *el-Metalibu’l-‘Alîye* daye. Qadî Beydawî (w. 685/1236) bi navê *Tewaliu’l-Enwar*, li ser ilmê kelam û felsefeyê berhemek daye. Giregirekî ji nûnerên ekola Matûrîdî, Nûreddîn es-Sabûnî (w. 580/1184) berhemek bi navê *el-Kifaye fî’l-Hidaye* ku di nav berhemên kelamî de gelek zêde bi hecm e, daye. Ebû’l-Berekat en-Nesefî (w. 710/1310) ku muellifekî Matûrîdî ye, bi navê *el-‘Umde* berhemek daye (Kılavuz, 2014: 168).

Siraceddînê Urmewî (1198-1283) ku bi eslê xwe ji Kurdên Îranê ye û alimekî navdar ê Şafiîyan ê ilmê fiqhê ye bi navê *Metaliu’l-Enwar*, berhemeke kelamî û mentiqî daye. Ev alim, di serdema Selçûqîyên Enedolê de, ji hêla Îranê hatîye û wî xwe li keş û hewaya ilmî ya bajarê Konyayê girtîye û heta wefata xwe li wir maye.

Ebû’l Hesen Elîyyi’bni Muhemmed bin Salime’l-Texellibî Seyfeddîn’el-Amidî ku sala 551’ê ya Hicrî, li bajarê Amidê welidîye û sala 631’ê li Dimeşqê wefat kirîye (Amidî, 1985: 242), bi navê *Ebkaru’l-Efkar* berhemeke kelamî, li ser bingeha ekola Eş‘erî daye. Peyre, wî bi navê *Xayetu’l-Meram fî Îlmi’l-Kelam* berhemek daye û nêrînên xwe yên kelamî tê de dîyar kirine.

Xuyanîyekî girîng ê ekola Henbelîyan Teqîyeddîn Îbn Teymîyye (w. 728/1328) risaleyek bi navê *el-'Eqîdetu'l-Wesitîyye* nivîsîye û li ser ʿeqîdeyê, nêrînên xwe derbirîne. Li gor çavkanîyên muteber, Îbn Teymîyye nêzî 50 berhem li ser ilmê kelamê dane. Alimê herî muhîm ê Şîʿa, Nasireddîn et-Tûsî (w. 672/1274), di warê ilmê kelamê de du berhemên bi navê *Tecrîdu'l-Eqaid* û *Qewaidu'l-Eqaid* nivîsîne. Nûnerekî serdema "Şerhvanî û Haşîyevanîyê" Eduddîn el-Îcî (w. 756/1355), bi navê *el-Mewaqif fî Ilmi'l-Kelam* nivîsîye (Kılavuz, 2014: 168-169).

Sadeddîn Mesûd b. ʿUmer et-Teftezanî (792/1390), bi navê *Şerhu'l-ʿEqaid* berhemek nivîsîye. Ev berhem, şerha kitêba ʿUmer en-Nesefî ya bi navê *el-'Eqîde* ye (Kestelî, 1315: 6). Dîsa Teftezanî, berhema xwe ya bi navê *el-Meqasid*, bi navê *Şerhu'l-Meqasid* şerh kirîye. Ev şerh, di dîroka kelamê de, dibe ku wek mînaka ewil a herî bihecim ku di Serdema Şerhan de hatîye nivîsîn bête qebûlkirin. Hem *Şerhu'l-ʿEqaid* hem *Şerhu'l-Meqasid*, bi sedsalan di medreseyên serdema Osmanî de, wekî kitêbên dersê hatine xwendin. Seyyîd Şerîf el-Curcanî (w. 816/1413) li ser *Mewaqif*a Îcî, berhema şerhî ya bi navê *Şerhu'l-Mewaqif* nivîsîye. Kelamnasê Eşʿerî Celaleddîn ed-Dewwanî (w. 908/1502) berhema xwe ya bi navê *Şerhu'l-ʿEqaidi'l-Edudîyye* nivîsîye. Ev kitêb jî, di medreseyên Osmanî de wek kitêba dersê hatîye xwendin. Vê serdemê, Kemaleddîn Îbnu'l-Human (w. 861/1457) ku ji Sêwazê ye, bi navê *el-Musayere* kitêbeke kelamê nivîsîye ku tê de nêrînên Eşʿerî û Matûrîdî daye ber hev. Hizir Beg (w. 863/1459) ku Qazîyê ewil ê Stenbolê ye, muellifê kitêba kelamê ya bi navê *el-Qesîdetu'n-Nûnîyye* ye. Ev berhem, menzûm e û risaleyeke li ser ʿeqîdeyê ye. Ji alimên serdema Fatih Sultan Mehmed, Xeyalî Ahmed Efendi (w. 875/1470), berhemeke bi navê *Haşîye ʿela Şerhi'l-ʿEqaidi'n-Nesefîyye* di warê ʿeqîdeyê de nivîsîye. Hocazade Muslihuddîn Mustefa (w. 893/1488) jî mîna Xezzalî, berhemeke bi navê *Tehafutu'l-Felasife* nivîsîye û rexne li nêrînên felsefevanan girtîye. Elî el-Qarî (w. 1014/1605) li ser *Fiqhu'l-Ekber*a Ebû Henîfe, bi navê *Minehu'r-Rewdi'l-Ezher fî Şerhi'l-Fiqhi'l-Ekber* şerhek nivîsîye. Kemaleddîn el-Beyazî, yan jî Beyazîzade Ahmed Efendi (w. 1098/1687), bi navê *el-Usûlu'l-Munîfe li'l-Îmam Ebî Henîfe* berhemek nivîsîye (Kılavuz, 2014: 169-170).

Li gor ku em ji ehlê medreseyên Kurdan hîn dibin[1], Kestelî (w. 901/1496), li ser berhema şerha Teftazanî, haşîyeyek bi navê *Haşîye ʿela Şerhi'l-ʿEqaid* nivîsîye û ev berhem digel "*Şerha Teftazanî*" a li ser *ʿEqîde*ya ʿUmer en-Nesefî li medreseyên Kurdan hatîye/tê xwendin. Ku Ehmedê Xanî ʿeqîdeya xwe ya menzûm dinivîse, êdî di medreseyên Kurdan de ev berhem dibe materyalê dersê.

---

1 Mela Salihê Kotekan, Mela Yûsufê Pîranî, Mela Selman û Mela Mihemed, sala 2016an, li medreseya Erxenîyê ev agahî li ser vê tehsîlê dane me.

Berhemên ku di “Serdema Nû” ya ilmê ‘eqîdeyê de hatine dayin jî gelek in. Nûnerekî ewil ê vê serdemê, Ebdulletîf Xarpûtî (1842-1914) ye. Navê berhema wî, *Tenkîhu’l-Kelam fî Eqaidi Ehli’l-Îslam* e. Wî berhemeke dî ya bi navê *Tarîxi Ilm-i Kelam* heye. Filibelî Ahmed Hilmî (1865-1914) ku alimekî Osmanî ye, berhemeke bi navê *Uss-i Îslam Hekaik-i Îslamîye’ye Mustenid y*ani *Akaid* nivîsîye. Di vê serdemê de alimekî gelek mezin İzmirli İsmail Hakkı (1869-1946), li ser ilmê kelamê, berhemeke girîng a bi navê *Yeni İlm-i Kelama Giriş* nivîsîye. Giritli Sırrı Paşa (1844-1895) ku ricalekî dawî yê dewleta Osmanî ye, berhemeke bi navê *Neqdu’l-Kelam fî Eqaidi’l-Îslam* nivîsîye. Wî, kitêba Teftezanî *Şerhu’l-Eqaid* wergerandîye zimanê Tirkî. Arapkirli Hüseyin Avni (1864-1954) ku di serdema xwe de di medreseyên bijarte yên Osmanî de muderrisîya ilmê kelamê kirîye, bi navê *İlm-i Kelam Dersleri* nivîsîye. Şeyxulîslam Mustefa Sabri Efendi (1869-1954) berhemek bi navê *Mewqifu’l-Eql we’l-Ilim we’l-Alem* nivîsîye. Ömer Nasuhi Bilmen (w. 1971) bi navê *Muvezzah İlm-i Kelam* nivîsîye (Kılavuz, 2014: 172-173). Xanî ne tê de, ‘eqîdenûsên Kurd jî, bi giştî dikevin bin banê vê serdemê. Çunkî wan, bi giştî di nav van salan de berhemên xwe dane.

**9. 1. Berhemên li Ser Ulûhîyetê**

Di edebîyata Îslamê de, sê cure berhem hene ku li ser nav û heyîn û ulûhîyeta Xwedê hatine nivîsîn: *Esmaillahi’l-Husna, Tewhîd* û *Munacat*. Gelek berhemên mensur/pexşan û menzûm li ser *Esmau’l-Husna* hatine nivîsîn ku ew jî wek cureyên edebî hatine qebûlkirin. Tevî ku piranîya wan bi zimanê Erebî ne, yên ku bi Farisî, Tirkî û Kurdî jî hatine nivîsîn hene.

**9. 1. 1. Berhemên Erebî yên li Ser Ulûhîyetê**

Xezzalî (w.1111), bi navê *Meqasidu’l-Esma fî Şerhi Esmaillahi’l-Husna* berhemek daye. Beyzawî (w. 1286), bi navê *Muntehe’l-Muna fî Esmaillahi’l-Husna* kitêbek nivîsîye. Fexredîn Razî (w. 1209), bi navê *Lewaiu’l-Beyyinat Şerhu Esmaillahi’l-Teala we’s-Sifet* berhemek nivîsîye. Ji bilî van berhemên jor ên Erebî, çend berhemên ku bi Farisî jî hatine nivîsîn hene: Ebdurrehman Camî (w. 1492) bi navê *Risale-i Muemma-yi Nefîse* berhemek nivîsîye. Mîr Huseyn eş-Şirazî (w. 1499) bi navê *Şerhu’l-Esmai’l-Husna* kitêbek nivîsîye ku Lamiî Çelebî, ew wergerandîye Tirkî.

Mewlanzade Abdurrehman Nacîm (1834-1895) ku bi eslê xwe ji binemala Mewlanzadeyên Başûr e, bi navê *Sefwetu’l-Kelam* kitêbeke kelamî, sala 1869an ji bo dersdayinê, bi Erebî nivîsîye. (Nacîm, 1285: 3) Mehmet Nuzhet ew wergerandîye Tirkîya Osmanî. Ji 48 rûpelan pêk tê.[2]

---

2 Eslê vê berhemê, di İstanbul Büyükşehir Belediyesi Atatürk Kitaplığı de heye ku Seîd Veroj, li ser jîyan û berhemên Abdurrehman Nacîm sala 2017an pirtûkek çap kirîye û kopîyaya wê tê de hatîye nîşandan.

Ehmed bin Hesen el-Xasî el-Hizanî (1866-1951) ku ji Licêya Amedê ye, bi navê *Buşre'l-'Ibad fî ilmi'l-I'Itiqad* metneke menzûm sala 1324'an a hicrî, bi zimanê 'Erebî nivîsîye.[3] Di vê *Mecmû'e*yê de piştî vê 'eqîdeyê, bi navê *Menzûmetu Esmaillahi'l-Husna*, berhemeke dî ya Xasî cî girtîye ku ev jî menzûm e û bi zimanê Erebî ye. Piştî van, Xasî, du *Reddîye* jî tê de cih girtine ku bi Erebî ne. Xasî, ev Risaleyên xwe yên reddîyeyî, li hember hin fikrên kelamî yên Îsmail bin Şeyx Îbrahîm es-Si'irdî nivîsîne ku hem bi teşeyê nezmî ne, hem jî bi pexşanî ne.

Mela 'Elî ilmîyê Zîla (1923-1995), bi navê *el-Mecmû'û'l-Letîf fî ilmi'l-Kelami'l-Munîf* bi Erebî berhemeke mensûr nivîsîye. Wî bi xwe jî, şerha wê kirîye. Destxeta wî, neçapkirî maye.

Mela Seîdê Taxikî (1926-?), bi navê *el-Futûhatu's-Semedîyyetu fî'r-Reddi 'ela Muxaletati'l-Wehhabîyyeti we 'Ezemetu'l-Eshabi*, (Hêvîdar, 2009: 105) berhemeke kelamî bi Erebî nivîsîye.

Mewlana Ebûbekir, bi navê *Wuzûh*, *Enwer* û *Siracu'l-Qulûb*, sê berhem dane. Îbnu'l-Cezerî, berhemek bi navê *Zatu'ş-Şifa* daye. Beytûşî, du berhem bi navê *Kifaye* û *Şerhu'l-Kifaye*, ango *Hîfa* dane. Şêx Xalidê Silêmanîyeyî, berhemek bi navê *Şerh-i Meqamat* daye (Nacim, ragihîner Veroj, 1881: 2-3).

**9. 1. 2. Berhemên Tirkî yên li Ser Ulûhîyetê**

Muellifên ku bi Tirkî ev cure berhemên li ser Ulûhîyeta Xwedê nivîsîne jî zêde ne: Şeyhoğlu Mustafa (w. 1401), Îsa Saruhanî (w. 1559), Ahmed Şakir Paşa (w. 1818), Îbrahîm Cûdî (w. 1926) û Bıçakçızade Îsmail Hakkı (w. 1933) berhemên menzûm ên *Esmaê Husna* nivîsîne (Yıldız, 2013: 161).

Berhemên ku di forma cureyê *Tewhîdê* de hatine nivîsîn, li ser mijara yekîtî û tealîya Xwedê ne. Berhemên Tewhîdî, bi giştî bi teşeyê Qesîdeyê têne nivîsîn û wek cureyekî Qesîdeyê hatine qebûlkirin. Nîyazîyê Misrî (w. 1694) *Tewhîdeke tesewwufî* nivîsîye. Muhibbî (w. 1566) ku mexlesa Qanûnî Sultan Suleyman e, *Tewhîd*ek nivîsîye (Yıldız, 2013: 171-172).

Di edebîyata Îslamî ya Tirkî de navdartirîn berhema 'eqîdeyî ya menzûm ku bi zimanê Tirkî hatîye nivîsîn, *Manzûm Akaid*a Mehmed İlmî Efendi (w. 1636) ye ku di sedsala XVII'an de hatîye nivîsîn (Öztürk, 2013: 221). wisa dîyar e ku ev alim, hem bi serdema xwe, hem jî bi berhema xwe ya menzûm a kelamî, di dirûvê Ehmedê Xanî (w. 1709) de ye.

3 Mustensix Zeynelabidîn Amedî li ser berhemên Xasî *Mecmû'e*yek amade kirîye û bi navê *Buşre'l-'Îbad fî 'Îlmi'l-Î'tiqad* li Amedê daye çapê.

**9. 2. Berhemên Wergêrî yên li Ser Ulûhîyetê**

Li ber destê me bi navê *‘Eqîdetu’l-Îman* berhemeke Îbrahîm Heqqî Erzurûmî el-Husnî (1704-1780/1115-1194) heye ku sala 1190î bi Erebî hatîye nivîsîn û ji alîyê Muhemmed Bedreddîn Îbn Mela Derwîş et-Tilloyî ve li Sêrtê, digel wergera wê ya Trkî hatîye çapkirin.

Di Serdema Nû ya ilmê kelam de, Seîd Nûrsî (1873-1960) jî, bi Risale-i Nûr Külliyatı [*Kullîyata Risaleyên Nûr*] çexereke nû vekirîye. Berhema wî ya bi navê *Sözler*, [Peyv/Kelîmat] wek kitêbeke ilmê kelamê tête qebûlkirin. Di *Kelîmat*ê de Kelîmeya Dehan, bi navê *Risaleya Heşrê,* Kelîmeya Bîst û Heftan, bi navê *Risaleya Qederê,* Kelîmeya Bîst û Pêncan *Risaleya Qur’anê* hatîye binavkirin. Li gor pisporên kelamê, Seîd Nûrsî ku alimekî Îslamparêz ê Osmanî bû, di berhemên xwe de, mijarên dînî, li gor pirsgirêkên modern hunaye. Li hember wan ideolojîyên hevdem ku bi ser ciwanan de dihatin û wan ew dûçarî problemên îmanî-itiqadi dikirin, Nûrsî, bi berhemên xwe çare didîtin. Di vê lêgerê de wî ji daneyên zanistên pozitif jî bi awayekî berfireh mifa girt (Büyükkara, 2013: 225).[4]

Muhemmed Seîd Remezan el-Botî (1924-2015), bi navê *Kubre’l-Yeqînîyati’l-Kewnîyyeti* berhemeke kelamî daye. Beşa ewil, derbarê Ilahîyyatê de ye, beşa duyem derbarê Nubuwwetê de ye, beşa sêyem derbarê Kewnîyyatê de ye, beşa çaran jî, derbarê Xeybîyyatê de ye (el-Botî, 1394/1974: 3). El-Botî, bi Muqeddîmeyekê dest bi berhema xwe kirîye. Piştî ku behsa menheca/rêbaza ilmî ya alimên muslim dike ku bê ka bi çi awayî li heqîqetê digerin, îca behsa rêbaza ilmî ya alimên ne-muslim dike. Bi ser de dikeve pey bersiva vê pirsê: Gelo ew tiştê ku merıv muhtacî bi ‘eqîdeya sehîh a derbareyê kewn û heyatê dike çi ye? Di dawîyê de, cîyê “‘eqîde”yê di mecmûeya binyeya Îslamê de dîyar dike. Ev berhema vî seydayê Kurmanc, li zimanê Tirkî hatîye wergerandin. Ev kitêb, hîna jî li medreseyên Kurdan, wek kitêbeke nav mufredatê tê xwendin.

**9. 3. ‘Eqîdenameyên Kurdî yên li Ser Ulûhîyetê**

Mînakên Tewhîdnameyan, bi taybetî jî yên Munacatan di edebîyata klasîk a Kurdî gelek hene. Hin ji van Munacatan di nav berhemên mîna ‘eqîde û mewlûdan de ne, hinek jî jê bi tena serê xwe hatine nivîsîn. *Munacat*a Melayê Bateyî, di dawîya mewlûdê de cih girtîye. *Munacat*a Mela Ehmedê Heyderî, bi tena serê xwe ye û gelek dirêj e. Hin munacatên Kurmancî bi navê Tezeeruyê hatine binavkirin, hinek jî jê bi navê Munacatê.

4 *Sözler*a Seîd Nûrsî, ji alîyê Muhemmed Zahidê Gunehkar ve li Kurmancî hatîye wergerandin û Zehra Yayincilik, sala 2016an ew bi navê *Koma Gotinan* çap kirîye. Kelîmeya Bîst û Pêncan (*Mucîzatê Qur’anîye*) û Kelîmeya Dehan (*Risaleya Heşrê*) jî ji alîyê Ayhan Meretowar/Yıldız ve li Kurmancî hatine wergerandin û çapkirin.

**9. 3. 1. *Tewhîdname***

Di edebîyata Kurdî de, *Tewhîdname*yek di *Dîwan*a Ebdulfettahê Hezrowî de heye ku ji 63 beytan pêk hatîye. Navê vê berhemê, digel ku di çapa Nûbiharê de ku ji alîyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve hatîye amadekirin *'Eqîdename 3* hatîye nivîsîn (Ji bo metnê berhemê bnr. Hezroyî, 2002: 33-43) jî, di destxeta Zeynelabidîn Amedî de bi navê *Feslun fî Beyani Tewhîdillahi 'Ezze we Celle* sernavek li ser vê metnê hatîye danîn.

**9. 3. 2. *Sirru'l-Mehşer***

Feqe Reşîdê Koçer ê Hekarî (ss. XVIII) jî sala 1211/1796'an, bi navê *Sirru'l-Mehşer* kitêbeke 'eqîdeyî nivîsîye. Ev berhema wî, ji alîyê Osman Akdağ û Kerem Soylu ve hatîye transkrîpekirin û çapkirin. Piranîya vê berhemê bi awayê mesnewî ye û ji 20 beytî pêk tê. Wî di serî de cih daye *Munacat*ê jî.[5]

**9. 3. 3. *Me'rîfet û Zanîna Xwedê***

Mela 'Elîyê Ilmî yê Zîla (1923-1995), bi navê, *Me'rîfet, Hikmet* û *Zanîna Xwedê*, sê menzûme bi Kurmancî nivîsîne ku dudu jê bi terzê qesîdeyê, yek jî bi terzê mesnewî ye. Menzûmeyek li ser tefekkura wesfên Îlahî ku ji 30 beytan pêk tê nivîsîye û ew jî bi terzê qesîdeyê ye. Menzûmeyek li ser tarîfa wesfên Xwedê nivîsîye ku ji 7 beytan pêk tê û bi terzê mesnewîyê ye. Ev berhema wî di nav *Dîwan*a wî (Zivingî, 2012: 39-45) de cih digre.

**9. 3. 4. *Dermanê Derda***

Di edebîyata Kurdî ya klasîk a Îslamî de, berhema Muhemmed Zahir Zehrî ya bi navê *Dermanê Derda*, ji vî cureyî re mînakeke berbiçav e. Zeynelabidîn Amedî, ev berhem bi destê xwe li Nirçika Qulpê îstinsax kirîye û li Dîyarbekirê, sala 1999/1420î daye çapkirin. Ev berhem menzûm e û ji beşên bi navê *Muqeddime/Dua*, Dermanê Derda, Navmela, Tesewwuf, Silsile û Tewbeyê pêk hatîye. Menzûmeya Munacatê, 20 beyt e û bi terzê mesnewî ye.

**9. 3. 5. *Tezerruname***

Mela Nusredînê Zoqeydî (w. 1935) (Doskî, 2011: 28). bi navê *Tezerruname* berhemeke Munacatî ku ji 15 beytan pêk tê û bi terzê mesnewîyê ye, li dawîya *'Eqîdeya Îmanê* zêde kirîye (Doskî, 2011: 28).

**9. 3. 6. *Munacata Heyderî***

Mela Ehmedê Heyderî (w. 1937) ku di edebîyata Kurmancî *Dîwana Qesîdeyan* û *'Eqîdeya Îmanê* nivîsîye, bi navê *Munacat*ê, berhemek jî li ser Ulûhîyetê nivîsîye û ev jî bi teşeyê nezmî ye (Heyderî, 2012: 10-22). Heyderî, ev munacata xwe bi terzê mesnewîyê nivîsîye û hejmara beytên wê 140 e.

5 Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, sala 2002an ev berhem çap kirîye.

**9. 3. 7. *Îstîxase û Hewar***

Muhemmed Emîn Heyderî (1927-2003), bi navê *Îstîxas û Hewar*ê munacatek di dawîya *Eqîdeya Îmanê* de nivîsîye ku ji 24 malikan pêk tê.

**9. 3. 8. *Tezerru***

Mela Ebdulhadi el-Comanî (w. 2004) ku ‘eqîdenameyeke bi navê *‘Eqîdetu’l-Îmani* nivîsîye, ji alîyê Zeynelabidîn Amedî ve wek destxet di *Erbeu Menzumatin* de hatîye çapkirin. Tehsîn Îbrahîm Doskî jî sala 2011an ew li Hewlêrê daye çapkirin. Metnê *‘Eqîdetu’l-Îmani* ya ku bi destê Zeynelabidîn Amedî hatîye îstînsaxkirin, li serbeş û binbeşan nehatîye dabeşkirin; lê bi awayê ku ji xwendina beytên wê dîyar dibe, piştî ku behsa ruknên Îslamê û ruknên îmanê pêvekeke bi navê Tezerru”yê jî ku 65 beytan pêk tê lê zêde dike.

**9. 3. 9. Navên Xudê**

Husnî Hezîn Geçer ev pirtûka bi navê *Esamu’l-Husna* bi awayê pexşanî nivîsîye. Wateya 99 navê Xwedê rave dike. 18 rûpel e. Di nav kitêba wî ya bi navê *Rîsaleên ‘Eqîde û Exlaq û Edeb*ê de cih girtîye. Nûbiharê ew sala 2007an çap kirîye.

| Tewhîd-nameya Hezroyî | Munacata Feqe Reşîd | Marîfetullah ‘Elî Ilmî | Munacata Zahir Zehrî | Tezerru-nameya Zoqeydî | Munacata Ehmedê Heyderî | Munacata Emînê Heyderî | Tezerru-nameya Comanî |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 63 malik | 20 malik | 42 malik | 20 malik | 15 malik | 140 malik | 24 malik | 65 malik |

## 10. ‘EQÎDENAME DI EDEBÎYATA KURDÎ DE

‘Eqîdenameyên ku hatine nivîsîn, hinek bi teşeyê menzûm, hinekî jê bi şiklê mensûr/pexşan hatine nivîsîn. Ji ber ku ‘eqîdename hem bi Kurmancî, hem bi Soranî, hem bi Goranî û hem jî bi Kirmanckî hatine nivîsîn, li vê derê bi dorê navê wan, digel hin malûmatên kurt dê bihên dîyarkirin.

### 10. 1. ‘Eqîdenameyên bi Kurmancî yên menzûm

**10. 1. 1. *‘Eqîdeya Îmanê ya Ehmedê Xanî***

Ehmedê Xanî (1061/1651-1121/1709) di sedsala XVIIan a miladî de bi navê *‘Eqîdeya Îmanê*, berhemeke menzûm nivîsîye ku ev rastî sala 1099/1687an tê (Xanî, 2008: 42). Ev berhema wî, bi sedsalan di medreseyên Kurdan de wek kitêbeke dersê hatîye xwendin û hîna jî tê xwendin. *‘Eqîde*ya Xanî, bi *Nehcu’l-Enam*a Mela Xelîlê Sêrtî ya ku bi alfabeya ‘Erebî ye ve hatîye vekirin. Ev ‘eqîde, dibe ku di dîroka ilmê ‘eqîdeyê de, ewiltirîn berhem be ku bi Kurdî (Kurmancî) hatîye nivîsîn.[6]

6 Mela Ehmed Hilmî Qoxî ed-Dîyarbekirî, *‘Eqîdeya Îmanê* ya Ehmedê Xanî bi Kurmancî şerh kirîye û çap kirîye. Kadri Yıldırım, *‘Eqîdeya Îmanê* ya Xanî, bi zimanê Tirkî, bi awayekî

**10. 1. 2. *Nehcu'l-Enam***

Berhema Mela Xelîlê Sêrtî (1164/1750-1259/1843) ya bi navê *Nehcu'l-Enam* ku menzûm e, digel ku bi giştî exlaqî ye jî, ji hêla beşên serî ve dikeve bin banê ilmê ʿeqîdeyê. Ev berhem, di nav medreseyên Kurdan de wekî kitêbeke dersê hatîye xwendin û ji alîyê feqîyan ve hatîye jiberkirin (Adak, 2010: 148).[7]

**10. 1. 3. *ʿEqîdeya Îmanê ya Şêx Ehmedê Feqîr***

Şêx Ehmedê Feqîr (sedsala XIXan), ʿeqîdenameyeke menzûm a dirêj nivîsîye. ʿEqîdenameya wî, ji deh (10) beşan pêk hatîye. Beşa ewil 28 beyt, beşa duduyan 22, beşa sisîyan 14, beşa çaran 14, beşa pêncan 14, beşa şeşan 14, beşa heftan 14, beşa heştan 14, beşa nehan 14, beşa dehan 15 beyt e. Bi giştî dike 163 beyt.[8]

**10. 1. 4. *Xulaseyê ʿEqaid***

Şêx Ebdullahê Şemdînî (w. 1813), ev menzûmeya ʿeqîdeyê ya bi navê *Xulaseyê Eqaid* nivîsîye (Adak, 2015: 7).

**10. 1. 5. *Terîqu'n-Necat***

Mela Haşimê Miksî (1750-1850), vê *Terîqu'n-Necat*a ʿeqîdeyî nivîsîye; lê wek kitêbeke destxet maye. Hejmara rûpelên wê 36 e û ji 330 beytan pêk tê û dabeşî 5 beşan bûye (Taşkın, 2016: 66). wisa dîyar e ku ev berhem, ji hêla hecm û berfirehîya xwe ve di nav ʿeqîdenameyên Kurdî de derketîye dereceya herî bilind.

**10. 1. 6. *ʿEqîdetu'l- Îman***

Mela Nusredînê Zoqeydî (w. 1935) ku ji Cizîra Botan e, di teşeyê rûxsarî yê *ʿEqîdeya Xanî* de ʿeqîdenameyeke bi navê *ʿEqîdetu'l-Îman* nivîsîye. Yekûna wê, ji 153 malikan pêk tê û li ser behra el-muteqaribu'l-meqsûr e (Doskî, 2011: 28). Teşeyê wê yê nezmî ku mesnewî ye, li ser du beşên sereke hatîye hûnandin: Beşa ewil li ser "ruknên Îslamê" (kelîmeya eşhedê, nimêj, zekat, rojî û hec) ye; beşa wê ya duduyan li ser "ruknên îmanê" ye ku ew jî li ser mijara îmana bi Xwedê, melek, kitêb, resûl, roja axir, qederê pêk tê. Wek pêvekekê jî mijara "halê dunyayê", "terbîyeya nefsê" û "tezerrunameyek" lê hatîye zêdekirin.

**10. 1. 7. *ʿEqîdeya Kurdan***

Evdirehîm Rehmîyê Hekarî (w. 1958), ev menzûmeya ʿeqîdeyî ya bi navê *ʿEqîdeya Kurdan* nivîsîye. Teşeyê nezmî yê vê ʿeqîdenameyê "mesnewî" ye û ji van

---

berfireh şerh û analîz kirîye û digel wergera wê ya Tirkî ya menzûm di nav Weşanên Avestayê de sala 2008an çap kirîye.

7 Mela Ehmed Hilmî Qoxî ed-Dîyarbekirî, *Nehcu'l-Enama* Mela Xelîlê Sêrtî, sala 1990î bi Kurmancî şerh kirîye û wekî pirtûkeke xweser daye çapkirin.

8 Hayrullah Acar, ev ʿeqîdename gişt di nav *Dîwan*a wî de bi cih kirine û digel lêkolîna li ser edeb û hunera wî daye çapkirin.

binbeşan pêk hatîye: Dînê me (4 malik), şertên îmanê (4 malik), amnetu billah (9 malik), îmana bi melekan (5 malik), îmana bi kitêban (7 malik), îmana bi resûlan (9 malik), sifetên resûl (5 malik), ʿelametên qîyametê (3 malik), roja axir (13 malik), wesfê Cenabê Muhemmed (14 malik) û beytek li ser tarîxa nivîsîna berhemê. Bi giştî hejmara beytên/malikên wê 74 e.

*ʿEqîdeya Kurdan*, cara ewil sala 1334ê Rûmî; 1919ê Miladî li Stenbolê, di Çapxaneya Necm Îstiqbal de hatîye çapkirin (Doskî, 2011: 18).

**10. 1. 8. *Menzûmetu fî'l-ʿEqaid***

Ebdulfettah Fethî'l-Hezrewî (w. 1975), bi navê *Menzûmetun fî'l-Eqaidi*, berhemeke ʿeqîdeyî ya menzûm nivîsîye û ji alîyê Zeynelabidîn Amedî ve wek destxet li Dîyarbekirê, di nav Mecmûeya bi navê *Selasu Menzûmat* de hatîye çapkirin. Li gor vê destxetê, beşa wê ya ewil li ser "tewhîd"ê ye. Bi esamulhusna, behsa zat, sifet, fiîl, cisim û cewherê Îlahî dike ku bi temamî ketîye hurgulîya meseleyên kelamî û felsefî. Peyre ʿeqîdenûs, meseleyên mîna Hz. Îsa û nuzûla wî, Mesîh, Deccal, kerametê welîyan, rûtbeyên resûlan, dereceyên sehabîyan, sedemên ketina kufrê, meseleya heqbûna ezabê, dereceya îmanê li axretê ji xwe re kirîye mijar ku ev beş ji 62 beytan pêk tê. Beşa duduyan li ser fezîlet û sifetên nebîyan 25 pêxemberan û pêdivîya bawerîya bi wan nikirandîye ku ev jî bi giştî 36 beyt e. Bi vî awayî bi giştî dibe 98 beyt.[9]

**10. 1. 9. *Kitabu Nuzheti'n-Nufûs***

Mela Muhemmed Nûrî bin Mela Ebdillah, bi navê *Kitabu Nezheti'n-Nufûs* berhemeke ʿeqîdeyî, sala 1970yî bi awayê menzûm nivîsîye. Zeynelabidîn Amedî, sala 1990/1411ê ev wek destxet nivîsîye û di Metbeeya Dîyarbekirsozê de çap kirîye.

**10. 1. 10. *Rewdu'l-Heyat***

Mela Yasînê Şemê (k. d. 1994), bi navê *Rewdu'l-Heyat* berhemeke ʿeqîdeyî ya lokal li ser bawerîya bi roja Heşrê bi Kurmancî nivîsîye û sala 2011an, di nav Weşanên Nûbiharê de derketîye.

**10. 1. 11. *Menzûmetu'l-ʿEqaid***

Mela Xalidê Zengokî (1880-1950), bi navê *Menzûmetu'l-Eqaid* ʿeqîdenameyek bi awayê nezmî nivîsîye û ev berhem ji 631 beytan pêk hatîye (Tewerzî, 2009: 34).[10]

9 Tehsîn Îbrahîm Doskî, sê berhemên îtîqadî yên Ebdulfettahê Hezroyî berhev kirine û bi navê *ʿEqîdename 1, ʿEqîdename 2, ʿEqîdename 3*, di *Dîwan*a wî de bi cî kirîye, M. Xalid Sadînî ew ji tîpên Erebî latînîze kirine û Nûbiharê ew çap kirine. *ʿEqîdename 1,*ewil ji 36 beytan pêk tê, hejmara *ʿEqîdename 2,* 60 beyt e, *ʿEqîdename 3*, 63 beyt e (Hezroyî, 2012, r. 33-43).

10 Mela Zeynelabidîn Amedî, bi destê xwe ev berhem îstînsax kirîye.

**10. 1. 12. *'Eqîdeya Îmanê***

Mela Ehmedê Heyderî (w. 1937) ku ji hêla eşîra Asîyan a herêma Bazîdê ye, di edebîyata Kurmancî û ilmê Tesewwufê de alimekî şareza bûye. Wî digel *Dîwana Qesîdeyan* û *Munacatê*, berhemeke bi navê *'Eqîdeya Îmanê* jî nivîsîye (Heyderî, 2007: 2) û ev 'eqîde bi teşeyê nezmî ye (Heyderî, 2012: 10-22). Mela Ehmedê Heyderî, bavê şairê Kurmanc û mutesewwuf Mela Mihemed Emîn Heyderî ye.

**10. 1. 13. *Sebîlu's-Selami fî 'Eqîdeti'l-Enam***

Şêx Mûsayê Mêrdînî (w. 1992), bi navê *Sebîlu's-Selami fî 'Eqîdeti'l-Enami*, berhemeke 'eqîdewî-kelamî nivîsîye.[11] Destpêka wê 23 malik, Fedla Xwedê 35, Wacibîya 'Eqîdeyê 33, Melaik 14, Kitêb 6, Cuzê îmanê 42, Îmamê mezheban 24, 'Elametên qîyametê 8, Bawerîya bi meseleya qebrê 7, Heşir 69, Tewbe 7 û Wacibîya bawerîya bi îmanê 76 malik e ku bi vî awayî hejmara giştî ya malikên 'eqîdenameya Mêrdînî digihîje 344an.

**10. 1. 14. *'Eqîdetu'l-Îman***

Mela Ebdulhadi el-Comanî (w. 2004) ku ji hêla herêma Kurtelanê ye, ev 'eqîdenameya bi navê *'Eqîdetu'l-Îmani* nivîsîye.[12] Metnê *'Eqîdetu'l-Îmani* li serbeş û binbeşan nehatîye dabeşkirin; bes bi awayê ku ji xwendina beytên wê dîyar dibe, serê ewil bi hukmê zanîna bi ilmê 'eqîdeyê dest pê dike, peyre jî bi beytên xwe behsa ruknên Îslamê dike. Hejmara malikên derbareyê ruknên Îslamê de 37 e. Di beşa 'eqîdeya îmanê de du beytên ewil li ser bawerîya bi Xwedê ye, 11 beyt li ser bawerîya melekan, 7 beyt li ser kitêban, 5 beyt li ser resûlan, 11 beyt li ser heşrê, 3 beyt li ser bawerîya bi qederê ye ku ev gişt dike 37 beyt. Pêvekeka "Tezerru"yê jî 65 beyt e ku bi giştî digihîje 139 beytan.

**10. 1. 15. *'Eqîdetu'l-Îman***

Muhemmed Emîn Heyderî (1927- 2003), bi navê *Eqîda Îmanê* 'eqîdenameya menzûm nivîsîye (Heyderî, 2007: 3) û di nav Ayfa Basın de daye çapkirin. A niha ev berhem li ber destê me heye. 'Eqîdeya M. Emîn Heyderî ku bi terzê mesnewîyê hatîye nivîsîn, ji beşa "destpêk", her şeş ruknên îmanê û "Îstîxas û Hewar"ê pêk tê. Destpêk, ji 12 malikan, bawerîya bi Xwedê ji 8 malikan pêk tê. Behsa bawerîya bi melekan 9 malik, bawerîya bi kitêban 8 malik, bawerîya bi pêxemberan yek malikek e; lê bi serê wê de, 69 malik li ser wesfên Cenabê Muhemmed Pêxember hatine rêsan. Behsa 'elametên qîyametê ji 32 malikan, behsa bawerîya bi qîyametê ji 29

11 Mela Ebdusselam Bêcirmanî, bi navê *Mecmu'etu min Erbe'eti Kutub* li Stenbolê di nav Weşanên Nûbiharê de sala 2012an daye weşandin.

12 Ji alîyê Zeynelabidîn Amedî ve wekî destxet di *Erbeu Menzumatin* de hatîye çapkirin. Tehsîn Îbrahîm Doskî jî sala 2011an ew li Hewlêrê daye çapkirin.

malikan û beşa îstîxas û hewarê ji 18 malikan pêk hatîye. Hejmara giştî ya beytên wê, digihîje 195an.

**10. 1. 16. *‘Eqîdetu’l-Îman***

‘Eqîdenameya Mela Mihemedê Hezanî, ku bi beşa şîreta li ser hezkirina ji “ruknên Îslamê” dest pê dike û ev mijar heta beyta 20î dewam dike. Beşa ruknên îmanê, 51 beyt e. 8 beyt jî li ser mezheban e. Bi vî awayî hejmara wan digihîje 69 beytan. Beşa bi navê *Fî Beyani Be’zi’l-Mesaili’l-Fiqhîyye*, li ser hukmên huqûqî/fiqhî yên bawerîyê ne ku çawa bawerîya bi ruknên îmanê li ser mirovên mumin wacib e û ev jî ji 40 beytan pêk hatîye. Bi vî awayî hejmara giştî ya vê ‘eqîdenameyê digihîje 139 beytan. Li gor beyta dawîn a berhemê (Doskî, 2011: 70), Mela Mihemedê Hezanî, ev ‘eqîdenameya xwe, sala 1403/1983yan qedandîye.

Mela Mihemedê Hezanî, digel vê ‘eqîdeya bi Kurmancî, ‘eqîdenameyek jî bi Kirmanckî/Zazakî nivîsîye ku navê wê jî *‘Eqîdetu’l-Îman* (Doskî, 2011: 59) e.

**10. 1. 17. *Zemma Efkarê Batil***

Mela ‘Elîyê Ilmî yê Zîla (1923-1995), menzûmeyeke ‘eqîdeyî ku ji 70 beytan pêk tê, bi terzê mesnewîyan nivîsîye û tê de zemma fikrên serdema xwe zemm dike û berevanîya ‘eqîdeya sehîh a ehlê sunnet û cemaetê dike. Ev berhema wî di nav *Dîwan*a wî de cih digre.

Di Dîwana Ilmî (Zivingî, 2012: 33-34) de navê gelek berhemên ‘eqîdeyî hatine dayîn ku hejmara wan, digel Kurmancî û Erebî digihîje 17han.

**10. 1. 18. *‘Eqîda Îmanê ji bo Muminê Cîhanê***

Seyyîd Ebdulqadir Erzen ev ‘eqîdename, sala 2013an nivîsîye (Çiftçi, 2015: 4).

**10. 1. 19. *Cewheretu’l-Îman***

Şêx Muhemmed Hezîn (m. 1892) ev ‘eqîdename nivîsîye ku ji 200 beytî pêk tê (Qedrî, 2008: 38).

**10. 1. 20. *Menzûme fi’l-‘Eqaid***

Seydayê Hecî (m. 1975) ev ‘eqîdename nivîsîye ku ji 100 beytî pêk tê (Qedrî, 2008: 38-39).

**10. 1. 21. *Durra Semîn û Tuhfetu’l-Esdiqa***

Mela Yasîn (m. 1994) ev ‘eqîdename nivîsîne. *Durra Semîn* ji bo zarokan e ku ji 72 beytan pêk hatîye; *Tuhfetu’l-Esdîqa*, ji bo mezinan e ku ji 333 beytan pêk hatîye (Qedrî, 2008: 39).

**10. 1. 21. *‘Eqîdetu’l-Îman Gulcivîna Xort û Zarokê Kurdan***

Mela Ehmedê Delikî ev ‘eqîdename bi terzê mesnewîyê nivîsîye. Abdusselam

Bêcirmanî ev pirtûk ji bo çapê amade kirîye û sala 2005an li Stenbolê di Enes Matbaayê de daye çapkirin.

Muellif Ahmet Aksoy (Mela Ehmed b. Îsmaîl ed-Delikî Torî el-Meranî Melazgirdî), serê ewil ruknên Îslamê kirine mijar. Giranîya vê ʿeqîdeyê li ser wesf û jîyana Hz. Muhemmed Pêxember e. Di nav her beşekê de selat û selam li ser Cenabê Pêxember anîye. Beşa destpêkê ji 36 beytan pêk hatîye. Beşa xîmên Îslamê, bi behsa "Mucîzatên Pêxember" ketîye geşedanê. Ev beş, digel beytên piştî selat û selamê, digihîje 40 beytî. Beşa "Bav û Kalê Pêxember" 12 beyt e. Beşa "Wiladeta Pêxember" ji 15 beytan pêk hatîye. Hejmara beytên beşa "Zarokê Pêxember" 6 e; hejmara beşa "Hicreta Pêxember" 24 e. Hejmara beytên beşa "'Eşereê Mubeşşere" 10 e. Behsa "Îmama" ji 6 beytan pêk hatîye. Di pey van beşan de 24 beyt li ser limêjê, 4 li ser desmêjê, 2 li ser xuslê, 2 li ser teyemmumê ne. 20 beyt li ser zekatê, 7 li ser rojîyê û 8 beyt jî li ser hecê ne. Bi vî awayî behsa ruknên Îslamê qedîyaye.

ʿEqîdeya Îmanê, bi "Bawerîya bi Xudê" dest pê dike û ev beş 34 beyt e, beşa "Bawerîya bi Ferişteyan" 20 beyt, bawerîya bi kitêbên xudê 17 beyt e, behsa bawerîya bi pêxemberan 20 beyt, behsa bawerîya bi Qîyametê 61 beyt e, behsa bawerîya bi qedera xêr ûşer 4 beyt, behsa qerbê 7 beyt, behsa bawerîya bi Nefxa Sûrê 27 beyt e. Di dawîyê de "munacateke" bi navê "Dua û Zarîya ji Xudê" 15 bey te. Bi vî awayî gişt ji 418 beytan pêk hatîye.

**10. 1. 22.** ***Xulasa ʿEqîda Musulmanê Sunnî***

Mela Ehmedê Zinarexî ev ʿeqîdename nivîsîye ku ji 468 beytan pêk tê. Ev berhem bi tîpên Erebî hatîye nivîsîn û niha li ber destê me ye..

**10. 1. 23.** ***Rewşen***

Mele Muhemed Şefîq Aksu ev ʿeqîdename bi şeklê mesnewî nivîsîye. Berhem, ji du beşan pêk tê: Ji destpêkê heta rûpela 43yan mijara ʿeqîdeyê ye û hejmara beytên wê 860 e; beşa duyem li ser fiqha Şafiî ye û hejmara beytên wê 1560 ye (Acar, 2016: 382).

**10. 2. ʿEqîdenameyên bi Kurmancî yên Mensûr**

**10. 2. 1.** ***Gulzara Hemûka Şerha Nûbihara Biçûka***

Mela Ehmed Hilmî Qoxî ed-Dîyarbekirî, *Nehcu'l-Enama* Mela Xelîlê Sêrtî, sala 1990î bi Kurmancî şerh kirîye û navê *Gulzara Hemûka Şerha Nûbihara Biçûka* lê danîye.[13]

**10. 2. 2.** ***Kitabu Rehberi Sanî Şerha Eqîda Şeyx Ehmed bin Ilyas el-Xanî***

Mela Ehmed Hilmî Qoxî ed-Dîyarbekirî, *ʿEqîdeya Îmanê* ya Ehmedê Xanî bi

---

13 Ev berhem di nav weşanên İhsan Yayınları de hatîye çapkirin.

Kurmancî şerh kirîye û navê *Kitabu Rehberi Sanî Şerha ‘Eqîda Şeyx Ehmed bin Ilyas el-Xanî* lê danîye. Sala nivîsandina wê, 1974 e (Dîyarbekirî, 2014: 74).[14]

**10. 2. 3. *‘Eqîdetu’l-Îman***

Ebdullah Îbn Mehmûd en-Neqşebendî, bi navê *Îrşadu’l-‘Îbadi min ‘Ewami’l-Mu’minîn*, berhemeke ‘eqîdeyî û fiqhî li ser ‘eqîdeya mezhebê Şafiî, bi awayê pexşan bi Kurmancî nivîsîye û ev kitêba wî, sala 1960î, di çapxaneyeke nedîyar de û bi awayekî bêdîrok hatîye çapkirin (Neqşebendî, 1379/1960: 4). Serê kitêbê, bi beşa *‘Eqîdetu’l-Îman* dest pê dike. Di nav raveyên Kurmancî de bend û hedîsên bi zimanê Erebî jî cî girtine. Hejmara rûpelên beşa ‘eqîdeyê heşt e. Di *Îrşadu’l-‘Îbadi min ‘Ewami’l-Mu’minîn* de piştî dîyarkirina ruknên îmanê, mijarên mîna weledên Hz. Pêxember, zewceyên wî yên tahir, telqîna mirîyan, ehlê sunnet û cemaetê, şerî‘eta Pêxember, fezîleta sehabî, tabiîn, tebeê tabiîn, kerametên welîyan, mezhebên heq û bi taybetî behsa mezhebê Îmam Şafî hatine nivîsîn. Piştî ku beşa ‘eqîdeyê qedîyaye, êdî bi temamî mijarên fiqhê yek bi yek hatine vegotin.

**10. 2. 4. *‘Eqîdetu’l-Îman***

Şêx ‘Elaeddîn el-Xeznewî, bi navê *et-Tuhfetu’l-‘Elaîyye fî ‘Ulûmi’ş-Şerîyyeti bi’l-Luxeti’l-Kurdîyyeti el-Lehcetu’l-Kurmancîyye* çend binbeşên ‘eqîdeyî, digel ilmê fiqhê nivîsîye. Ji meselyên zat û sifetên Xwedê, ji xêr û şer, resûl û nebîyan heta kitêb û melekên Xwedê behs dike. Ev kitêb, ji alîyê Muhemmed Nûrî Nas ve hatîye çapkirin ku navê metbeeyê, cîyê çapê û dîroka wê ne dîyar e.

**10. 2. 5. *‘Eqîdeya Îmanê ya Anonîm***

Berhemek bi navê *‘Eqîdeya Îmanê* ku mensûr e bi Kurmancî heye ku nisbeta wê bi bal Ehmedê Xanî ve tê kirin; lê hîna jî bi awayekî delîldêrî nivîskarê wê ne dîyar e. Ev berhem, di nav feqîhên Kurdan de wek kitêba dersê hatîye xwendin û wek *‘eqîdeyeke anonîm* jî tê dîtin. Ehmed Hilmî Qoxî, ev ‘eqîde, digel têbinîyan ji nû ve nivîsîye û di nav weşanên İhsan Yayınları de, bi navê *‘Eqîda Îmanê ji Bo Zarokê Kurmanca*, li Stenbolê daye çapkirin; bes dîroka çapê li serê tune ye. Muhemmed Masûm Dilbirîn Botî ji, *‘Eqîdeya Îmanê* ya anonîm, sala 2012an, ji nû ve nivîsîye û tehqîq kirîye û navê *Şehîn û Weqa* lê danîye û daye çapkirin.

**10. 2. 6. *Tuhfetu’s-Subyan***

Navê musennifê vê berhemê, Şêx Yûsuf el-Beyazîdî ku bi navê xwe yê meşhûr Xelîfe Yûsuf tê naskirin, li serê hatîye nivîsîn. Ev berhem, gava mirov metnê wê dide ber *Îrşadu’l-‘Îbad min ‘Ewami’l-Mu’minîn*ê, bêje bi bêje pê re yek bi yek e; çi heye ku metnê *Tuhfetu’s-Subyan*, di hin cîyan de kurt hatîye girtin. Navê muellifê

14 Ev berhem, sala 2014an, ji alîyê warisên Qoxî ve hatîye çapkirin. Wek navnîşana wê, abdulkuddushilmi@gmail.com hatîye dîyarkirin.

*Îrşadu'l-'Îbad min 'Ewami'l-Mu'minîn,* 'Ebdullah Îbn Mehmûd e; lê navê muellifê *Tuhfetu's-Subyan*, Şêx Yûsuf el-Beyazîdî ye.

Ev 'eqîde jî, mîna *Îrşadu'l-'Îbad,* bi behsa ruknên Îslamê dest pê dike û van ruknan jî ji hêla fiqhê ve dinikirîne. Beşa 'eqîdeya îmanê ku zêde dişibe *'Eqîdeya Anonîm*, bi ruknê ewil ê wehdanîyetê dest pê dike, peyre bi mijara bawerîya bi melek, kitêb, pêxember, roja qîyametê û qederê berdewam dike.[15]

**10. 2. 7. *Gulnar***

Ebdirrehîm lawê Ebdulkerîm Şemrexî, bi navê *Gulnar* kitêbeke 'eqîdeyê nivîsîye û ev berhem, di nav weşanên Mektebetu Seyda de hatîye çapkirin. Berhem, pexşan e û bi awayê pirs-bersiv hatîye amadekirin ku ji çil rûpelî pêk tê û hejmara pirs û bersivên wê diihîje 100î.

Hejmara pirs û bersivên derbareyê bawerîya bi Xwedê de 18, yên li ser bawerîya melekan/fereşteyan 1, li ser kitêban/pirtûkan 1, li ser resûlan/qasidan 10, li ser roja axir 19, (ev der dubare bûye), li ser qeder û qezayê 8 (pirs û bersivên vê derê jî dubare bûne) e. Piştî van behsan îca dor hatîye ser pirs û bersivên ser ruknên Îslamê. Ji berhemê wisa dîyar dibe ku muellif, îlhama xwe ya terzê "pir-bersiv"ê ji wê hedîsa navdar a bi navê *Hedîsa Cibrîl* girtîye. Li ser bergê dawîn ê pirtûkê, ev nezm hatîye nivîsîn:

Divê Qur'annûxwendî vê bixwîne
Da ku haydar bibe ji îman û dîn e
Dilê me tev kul û derd û birîn e
Li ser kesê nezan e kî dihebîne
'Eqîdakî gelek safî û zelal e
Pirs û bersiv e rind û delal e
Postego ji biçûka'r bib heval e
Kesê wî nek heval e dê binale

**10. 2. 8. *'Eqîdeya Îmanê***

Muhemmed Masûm Dilbirîn Botî, *'Eqîdeya Îmanê* ya Îbrahîm Heqqî Erzerûmî wergerandîye Kurmancî û digel tehqîqa wê, di nav Yolcu Kitabevi de daye çapkirin. Ne cîyê çapê dîyar e, ne jî dîroka wê. Hejmara pirs û bersivên 'eqîdeyî yên vê pirtûkê 52 ye. Li gor ku di rûpelên wê de dîyar dibe, muellifê yê wergêr, ev berhem sala 2012/1433yan qedandîye.

15 *Tuhfetu's-Subyan*, di nav Weşanên Nûbiharê, sala 2008an hatîye çapkirin.

**10. 2. 9. *Bed'ul-Emalî***

Hacî Ebdulfettah el-Hezroyî, berhema bi navê *Bedʿu'l-Emalî* ya ʿeqîdeyê ku bi Erebî ye, wergerandîye Kurmancî û bi awayê menzûm nivîsîye (Adak, 2015, r. 7).

**10. 2. 10. *ʿEqîde û Fiqha Zelal***

M. Burhan Hedbî, bi navê *ʿEqîde û Fiqha Zelal* berhemeke fiqhî û ʿeqîdeyî nivîsîye. Mijarên mîna şertên îmanê, bawerîya bi Xwedê, melek, kitêb, pêxember, roja dawî, roja heşrê, qeder û qezayê tê de hatine ravekirin. Hejmara rûpelên wê 11 ye.[16]

**10. 2. 11. *Şehîn û Weqa***

Muhemmed Masûm Dilbirîn Botî, *ʿEqîdeya Îmanê* ya anonîm, sala 2012an, ji nû ve nivîsîye û bi Kurmancî tehqîq kirîye û navê *Şehîn û Weqa* lê danîye, ji 14 rûpelan pêk tê û di nav Yolcu Kitabevi de daye çapkirin. Ne cîyê çapê dîyar e, ne jî dîroka çapê. Muellif, li ser rûpelê wê yê ewil wuha nivîsîye: *Şehîn û Weqa Behsê Diket Ji ʿEqîda Kurmancî û ʿEqîda Îbrahîm Heqqî*.

**10. 2. 12. *Cewahiru ʿEqîdetu'l-Îslami we'l-Îman***

Li gor agahîyên a nuha (Doskî, 2011: 83), muellifê vê ʿeqîdenameyê ne dîyar e; lê du destxetên wê li ber destê me hene. Destnivîsa ewil, ji alîyê Muhemmed b. Mela Ehmed ve sala 1278/1861ê de hatîye nivîsîn; nusxeya duduyan, ji alîyê ʿElî el-Esem b. ʿUmer Îzeddîn ve sala 1326/1908an hatîye nivîsîn.

**10. 2. 13. *ʿEqîdetu'l-Îman***

Ev ʿeqîdename, ji alîyê Xelîfe Yûsufê Bayezîdî ve sala 1326/1908an di Çapxaneya Tereqqî de, li Dîmeşqê hatîye çapkirin. Wê navekî dî jî heye ku jê re *Tuhfetu'l-ʿAmilîn we Îraşdu'l-ʿAbidîn* hatîye gotin. Xelîfe Yusûf, kurê Şerîf Axayê Bayezîdî ye û sala 1302/1884an li gundê Zengezorê ku nêzî bajarê Bayezîdê ye hatîye dunyayê. Di terîqeta Neqşebendîyan de xelîfeyê Şêx Muhemedê Reşîdê Dêrşewî bû ku sala 1387/1968an li gundê Çalxana Tacdo rehmet kirîye. (Doskî, 2011: 83-84).

**10. 2. 14. *Cewhera ʿEqîdeya Îslamê***

Şeyx Tahir bin Salih el-Cezairî (h. 1268-1338), bi navê *el-Cewheru'l-Kelamîyye* berhemek nivîsîye ku di medreseyên Kurdan de, wek kitêbeke dersê cî girtîye. Ev kitêb, bi awayê pirs û bersivan hatîye amadekirin (Cezairî, 2013: 1). Abdusselam Bêcirmanî û Muhemmed Bêrkevanî, ev berhem bi navê *Cewhera ʿEqîdeya Îslamê* wergerandîye Kurdîya Kurmancî û daye çapkirin. Li gor ku em ji seydayên medreseyan (Mela Salihê Kotekan û muderrisên medreseya Erxenîyê) hîn bûn, ev kitêb, hîna jî di nav kitêbên rêzê yên feqîhên Kurmanc û Kird de tê xwendin.

---

16 Weşanxaneya Nûbiharê ew sala 2011an çap kirîye.

**10. 2. 15. *'Eqîdeê Îmanê***

Kitêb, ji alîyê Husnî Hezîn Geçer ve bi awayê pexşanî hatîye nivîsîn. Di nav kitêba wî ya bi navê *Rîsaleên 'Eqîdeê û Exlaq û Edeb*ê de wek "pirtûka ewil" cih girtîye. Nivîskar, bi behsa kelamê dest pê kirîye û terîmên mîna teqlîd, muqellid, hukmên şerî'etê, îman, dîn, pênase kirîye. Peyre mijarên mîna zat û sifetên Xwedê, qeza û qeder, dîtina Xwedê li axretê, pêxemberî, mucîze, îmamên 'emelî û îtîqadî, kerametên welîyan, melek, suala qebrê, 'elametên xerabûna dunyayê, pifkirina li sûrê, heşir, şefaet, şehîdî, pênc parastîyên mirovan, bid'e û meseleya helbestê girtîye dest.[17]

**10. 2. 15. *'Eqîdetu'l-Kurdîyye***

Şêx Ebdurrehman el-Farûqî el-Botî el-Mêrgî (w. 1974) ev 'eqîdename bi awayê pexşan û bi alfabeya Erebî nivîsîye. Nivîskar, serê ewil li ser hukmê hînbûna ilmê 'eqîdeyê agahî dane, peyre jî derbasî pênase û cureyên îmanê bûye. Piştî ku behsa roja Qalu Bela bûye, êdî nû dest bi mijara ruknên îmanê kirîye. Behsa derbareyê ruknên îmanê, di rûpelê 15an de diqede. Piştî vê, dor hatîye ser ruknên Îslamê û dîsa mijar ketîye ser meseleyên îmanî yên mîna sifetên Xwedê, kerametên welîyan, suala qebrê, mucîze û şefaetê. Mijar, bi behsa îmam û mezheb û hukmên dînî diqede. Di dawîya vê berhemê de menzûmeyeke 'eqîdeyî jî lê hatîye pêvekirin ku ji 17 rêzikan pêk tê.[18]

**10. 3. 'Eqîdeyên Wergerî**

**10. 3. 1. Tercema Fiqhu'l-Ekber**

Mela Ehmed Afşîn, ew ji eslê wê Erebî, bi awayê mensûr/pexşan wergerandîye. Destxeta wî li ber destê me heye; sala wergera wê ne dîyar e.

**10. 2. 'Eqîdenameya Bi Goranî**

**10 2. 1. *el-'Eqîdetu'l-Merdîyye***

Mewlewî (h. 1221-1300) ku di ilmê kelamê de şareza ye, bi navê *el-'Eqîdetu'l-Merdîyye*, berhemeke 'eqîdeyî, bi şêweya/dîyalekta Goranî nivîsîye. Ev berhem, sala 1352yan li Mesîrê hatîye çapkirin (Arif, 1981: 321-322). Helbet wekî dî dibe ku berhemên dî jî hebin; bes a ku di vê xebatê de agahîya wê bi destê me ket, ev bû.

**10. 3. 'Eqîdenameya Bi Soranî**

---

17 Nûbiharê ew sala 2007an çap kirîye.

18 Muhemmed Muxlis b. Şêx Ebdurrehman ev metin ji bo çapê amade kirîye û Nûbiharê, sala 2013an ew çap kirîye.

**10 3. 1. *Eqdu’l-‘Eqaîd***

Mehwî (1831-1906)), bi Kurdîya Soranî, menzûmeya ‘eqîdeyê nivîsîye. Ev menzûme, di nav *Dîwan*a wî de, wek “Qesîdeya Yekem” cî girtîye. Navê wê, *Eqdu’l-Eqaîd* e. Berhem, ji 136 malikan pêk hatîye (Ahmad, 2016, r. 14). Ev ‘eqîdeya Mehwî ku bi navê *Gerdenbendên Bawerîyê* (Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Ahmad, 2016, r. 41) jî tê binavkirin, dîyar dibe ku digel paşxaneyeke dînî tesewwufî hatîye nivîsîn û termên felsefî jî di nav xwe de dihewîne. Ji bilî vê berhemê, dibe ku hin berhemên dî yên ‘eqîdeyî bi Soranî hatibin nivîsîn.

**10. 4. ‘Eqîdenameyên Bi Kirmanckî /Zazakî**

‘Eqîdeyên îmanê ku bi Zazakî hatine nivîsîn, hem bi awayê menzûm in, hem jî bi awayê nesrî/pexşanî ne.

**10. 4. 1. ‘Eqîdenameyên Kirmanckî yên Menzûm**

**10. 4. 1. 1. *‘Eqîdey Îman-‘Eqîdey Îslam***

Mela Mehemed Elî Hûnî (1930-?), bi navê *‘Eqîdey Îman-’Eqîdey Îslam*, berhemeke ‘eqîdeyî, bi Kirmanckî/Kirdkî nivîsîye û sala 1970yî de telîf kirîye (Hûnî, 2004: 11). Hejmara beytên wê, 66 e. Weşanxaneya Vateyî, sala 2004an ew li Stenbolê daye çapkirin.

**10. 4. 1. 2. *Qesîdeya Dîyin***

Mele Mehemed Demîrtaş ev ‘eqîde bi awayê menzûm nivîsîye û hejmara beytên wê 52 ye ku di nav *Dîwan*a wî ya ku sala 2006an hatîye çapkirin de cih girtîye (Çiftçi, 2015: 5).

**10. 4. 1. 3. *‘Eqîdetu’l-Îman***

Mela Mihemedê Hezanî ku hem bi Kurmancî, hem jî bi Kirmanckî/Zazakî şiîr û nivîsîne, du berhemên ‘eqîdeyî jî nivîsîne: *‘Eqîdetu’l-Îman*a bi Zazakî (Adak, 2015: 8) û *‘Eqîdetu’l-Îman*a Kurmancî (Doskî, 2011: 59). Li ser ‘eqîdeya Kurmancî ya Hezanî, li jorê agahî hatine dayîn.

Metin Çiftçî, li ser ‘eqîdeya Hezanî, di Unîversîteya Bîngolê de sala 2015an tezê masterê amade kirîye. Li gor ku ew radighîne, metnê bi alfabeya Erebî ya vê ‘eqîdeyê, ji hêla M. Malmîsanij û Roşan Lezgîn ve hatîye latînîzekirin û di kovara *Vate*yê de hatîye weşandin.

Mela Mihemedê Hezanî, ev ‘eqîdeya xwe, di navbera salên 1979 û 1980yan de bi alfabeya Erebkî nivîsîye. Hejmara beytên wê 144 e (Çiftçi, 2015: 1). Teşeyê nezmî yê vê ‘eqîdeya îmanê mesnewî ye. Di vê ‘eqîdeyê de serî ewil beşa “Ruknên Îslamê” heye, peyre dor hatîye ser “Ruknên Îmanê”. Hejmara giştî ya beytên wê 144 e. Ji van, 46 beyt fiqhî ye; 78 beyt ‘eqîdeyî ye.

### 10. 4. 2. ʿEqîdenameyên Kirmanckî yên Mensûr

#### 10. 4. 2. 1. *Beyatname*

*Beyatname*yeke Dimilkî/Zazakî ku bi awayê mensûr, berî çil salî hatîye nivîsîn li ber destê me heye ku bi qismî be jî, berhemeke ʿeqîdeyî ye. Hecî Necmeddîn Uçar ku mirîdekî berê yê Şêx Silhedînê lawê Şêx Seîdê Paloyî ye, dîyar dike ku Şêx ev *Beyatname* bi alfabeya Latînî daye nivîsandin û di metbeeyê de daye çapkirin û wek pirtûkokekê li mirîdan belav kirîye. Me îzîn ji Hecî Necmedînê Goma Şek a Pîranê girt û navê wê li vê derê qeyd kir. Dibe ku ev pirtûka piçûk, ji hêla dîroka edebîyata Dimilkî ve cîyekî gelek girîng bigire; Çunkî tê de behsa ruknê îman û Îslamê heye.

#### 10. 4. 2. 2. *ʿEqîdeta Zazakî*

Mela Mihemedê Muradanî ʿeqîdenameyeke Zazakî bi awayê pexşanî nivîsîye. Ev berhem, ji 36 rûpelna pêk hatîye (Çiftçi, 2015: 5).

## 11. KARÎGERÎYA ʿEQÎDENAMEYÊN KURDÎ DI ʿEQÎDEYA ÎSLAMÎ DE

Gava meriv berê bala xwe dide berhemên Kurdî yên ilmê ʿeqîdeyê, helbet rewşa mufredata medreseyên wan tê pêşberî çavan. Di medreseyên Kurdan de ji kitêbên alimê Ehlê Sunnet û Cemaetê, bi taybetî berhemên ekola Eşʿerî hatine xwendin. Berî Ehmedê Xanî berhemên ʿeqîdeyî ku di nav "kitêbên rêzê" de hatine xwendin, digel ku ne bi awayekî zelal be jî; bes digel *ʿEqîde*ya Xanî, *Şerhu'l-ʿEqaid*a Sadeddîn et-Teftazanî (w. 792/1390) hatîye xwendin û *ʿEqîdeya Tehawî* jî di nav alimên Kurdan de cîyê xwe girtîye. Şerha wê ya ku ji alîyê Muhemmed b. Muhemmed el-Babirtî (w. 786k) dîsa li medreseyan hatîye xwendin. Wek kitêbên derveyî kitêbên rêzê, *Cewheretu't-Tewhîd* û *Risaleyên Nûr* ên Bedîuzzeman (w. 1960) hatine xwendin (Seîd, 1998: 20). Dibe ku ʿeqîdenûsên Kurd, ji ber vê egerê, di bin bandora van aliman de mabin û berhemên xwe wisa dabin. Ji ber ku hecma vê gotarê dest nade, wek mînak, dê sê berhemên Kurdî li vê derê bihêne nikirandin:

Ehmedê Xanî (w. 1709) bêyî ku bikeve hurgilîyan, *ʿEqîdeya Îmanê* li ser bingeha Ekola Sunnî (Eşʿerî) nivîsîye (Xanî, 2008: 42) û mijarên bingehîn ên ruknên îmanê ku bawerîya bi Ellah, melek, kitêb, pêxember, axret û qederê girtîye dêst. Xanî, bi vê berhema xwe, bûye mînak ji alimên medreseyên Kurdan re û di pey wî re jî gelek ʿeqîdename li ser vê bingehê, bi Kurmancî, Goranî, Soranî û Kirmanckî hatine nivîsîn. Mela Ehmed Hilmî Qoxî ed-Dîyarbekirî ku *ʿEqîdeya Îmanê* ya Ehmedê Xanî bi Kurmancî şerh kirîye, navê *Kitabu Rehberi Sanî Şerha Eqîda Şeyx Ehmed bin Ilyas el-Xanî* lê danîye û ew jî li ser heman îtîqadê çûye.

Gava meriv ji hêla dîroka zanistên pozîtîf ve li serdema Xanî dinihêre, meriv dibîne ku di warê fikir, zanist û hunerê de gelek guherînên mezin çê bûne û van

zihnîyetan, bi awayekî aktîf fikir û zanîna 'alema Îslamê girtîye bin bandora xwe. Bi Ronesansê re fikra Rojava ketîye serdemeke nû. Ew têgihîştina Batlamyusî ya "bîyosentrik"/"navend-dunya" ku nêzî 1500 salî li ser fikra Rojava desthiltdar bû, bi fikra zanistî ya Kopernik (1573-1543), ji binî hejîya û "Dêr"ên ku alîgirê fikra Batlamyus bûn jî pê re xeyalşikestî bûn. Bi awayekî zanistî hat peyitîn ku Dunya, ne di navenda Gerdûnê de ye û Gerstêrk ne li dora Dunyayê; lê li dora Rojê digerin. Bi vî awayî têgihîştina "helosentrîk" derket pêş. Galîle (1642-1726) jî, teleskop bi kar anî û cara ewil bi awayekî zanistî çavdêrîya Stêrkan kir û wî jî derbeke mezin li wê fikra ku digotin Gerdûn sabit e da û wî jî dîyar kir ku Dunya jî li dora Rojê digere. Bi vî awayî Dêr û zanist bi awayekî tundrawtir bûn dijberî hev. Piştî Galîle, Newton (1642-1726) jî di warê astro-fizikê de keşfa "qanûna erdkêşîyê" kir. Piştî wan, fîlozofên mîna Francis Bacon (1561-1626), Descartes (1596-1650) û David Hume (1711-1776) fikrên nû di warê felsefe û zanistê derxistin pêş. Fîlozofê felsefeya Ronahîtîyê Imanuel Kant (1724-1804) çexereke nû di warê metafizikê de vekir û hemû teorîyên ku li ser bingeha prensîbên 'eqil bûn, mandel/red kir û îddîa kir ku hebûna Xwedê, bi delîlên ontolojîk, kozmolojîk û teleolojîk, nahê îsbatkirin (Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Erdemci, 2014: 108-109). Ji van bûyerên mezin ên zanistê dîyar e ku alimên mumin ên Kurd jî muteessir bûne û wan jî di texm û hinda xwe de hewla bersivdana van fikir û bizavên nû, di warê 'eqîdeya Îslamê de daye.

Şêx 'Elaeddîn el-Xeznewî ku bi navê *et-Tuhfetu'l-'Elaîyye fî 'Ulûmi'ş-Şerîyyeti bi'l-Luxeti'l-Kurdîyyeti el-Lehcetu'l-Kurmancîyye* çend binbeşên 'eqîdeyî, bi Kurmancî û pexşankî nivîsîye, serê kitêbê, bi serbeşên mîna *"Behsa Kelima Şehadetê", Behsa Zat û Sifatê Xudê" Behsa Şitexilîya Xudê, Behsa Xeyr û Şerran* dest pê dike û bi mijarên dî yê ilmê 'eqîdeyê dirêjî dide mijaran. Ev mijarên ilmê kelamê, hema hema hemû tê de hene û bi qasî 33 rûpelan dewam dike, peyre derbasî mijarên fiqhê dibe.

Feqe Reşîdê Koçer ê Hekarî, di *Sirru'l-Mehşer*ê de serê ewil cî daye nav û sifatên Xwedê, peyre li ser 'elametên qîyametê beşek veqetandîye ku ev beş, dirêjtirîn helbest e. Piştre mijarên mîna rewşa cehennemê, mîzana roja heşrê, yek bi yek rewşa seffên mirovan di meydana heşrê de girtîye dêst. Bi mijarên "dasîtanên" li ser nefsa xwe û "Xatîme"yê diqedîne. Ku mirov li kitekitîya mijaran dînêre, tê dîtin ku Feqe Reşîd jî li ser şopa 'eqîdeya Ehlê Sunnetê meşîyaye.

Şêx Ehmedê Feqîr di *'Eqîdename*ya xwe de, serê ewil behsa adabê huzûra Îlahî dike. Piştî ku behsa şemailê Nebî dike, êdî li gor îtîqada Ehlê Sunnetê û Mezhebê Eş'erî, bi dorê behsa xelîfeyên raşid dike. Serê pêşî behsa menqibeyên Hz. Ebû Bekir, peyre Hz. 'Umer, Hz. 'Usman û Hz. 'Elî dike. Di pey wan de piştî behsa menqibeyên Hz. Hesen û Hz. Huseyn, îca behsa menqibeyên Hemze û 'Ebbas dike. Piştî van, ji Eimmeyên dîn ên çar mezheban dike û bi behsa menqibeyên 'Ebdulqadir Geylanî, 'eqîdenameyê diqedîne.

| Navê Berhemê | Navê Nivîskar | Teşeyê Wê | Zimanê Wê |
|---|---|---|---|
| *'Eqîdeya Îmanê* | Ehmedê Xanî | Menzûm | Kurmancî |
| *Xulaseyê 'Eqaid* | Ebdullahê Şemdînî (w. 1813) | Menzûm | Kurmancî |
| *Sirru'l-Mehşer* | Feqe Reşîdê Koçer | Menzûm | Kurmancî |
| *Terîqun'-Necat* | Mela Haşimê Miksî (1750-1850) | Menzûm | Kurmancî |
| *el-Eqîdetu'l-Merdîyye* | Mewlewî (h. 1221-1300) | Menzûm | Goranî |
| *'Eqdu'l-'Eqaîd* | Mehwî (1831-1906) | Menzûm | Soranî |
| *'Eqîdetu'l-Îmani* | Ebdullah Îbn Mehmûd en-Neqşebendî | Pexşan | Kurmancî |
| *'Eqîdetu'l-Îmani* | Şêx 'Elaeddîn el-Xeznewî | Pexşan | Kurmancî |
| *Kitabu Nezheti'n-Nufûs* | Mela Muhemmed Nûrî b. Mela Ebdillah | Menzûm | Kurmancî |
| *Menzûmetun fî'l-Eqaidi* | Ebdulfettah Fethî'l-Hedrewî(w. 1975) | Menzûm | Kurmancî |
| *Bed'u'l-Emalî* | Ebdulfettah Fethî'l-Hedrewî(w. 1975) | Menzûm | Kurmancî |
| *'Eqîdetu'l-Îmani* | Mela Ebdulhadi el-Comanî (w. 2001) | Menzûm | Kurmancî |
| *'Eqîdetu'l-Îman* | Muhemmed Emîn el-Heyderî (w. 2003) | Menzûm | Kurmancî |
| *Sebîlu's-Selami fî 'Eqîdeti'l Enami* | Şêx Mûsayê Mêrdînî (w. 1992) | Menzûm | Kurmancî |
| *Tuhfetu's-Subyan* | Şêx Yûsuf el-Beyazîdî | Pexşan | Kurmancî |
| *Menzûmetu'l-'Eqaid* | Mela Xalidê Zengokî (1880-1950) | Menzûm | Kurmancî |
| *'Eqîdey Îman-'Eqîdey Îslam* | Mela Mehemed Elî Hûnî (1930-?) | Menzûm | Dimilkî/ Kirmanckî |
| *Şehîn û Weqa* | Muhemmed Masûm Dilbirîn Botî | Pexşan | Kurmancî |
| *Eqîdeya Îmanê* | Muhemmed Masûm Dilbirîn Botî | Pexşan | Kurmancî |
| *'Eqîda Îmanê* | Muhemmed Emîn Heyderî | Menzûm | Kurmancî |
| *Gulzar* | Ebdirrehîm lawê Ebdulkerîm Şemrexî | Pexşan | Kurmancî |
| *'Eqîdetu'l-Îman* | Mela Mihemedê Hezanî | Menzûm | Kirmanckî/ Dimilkî |
| *'Eqîdetu'l-Îman* | Mela Mehemed Demirtaş | Menzûm | Kirmanckî/ Dimilkî |

| | | | |
|---|---|---|---|
| *ʻEqîdetu'l-Îman* | Mela Mehemedê Muradan | Menzûm | Kirmanckî/ Dimilkî |
| *ʻEqîdeê Îmanê* | Husnî Hezîn Geçer | Mensûr | Kurmancî |

**12. ENCAM**

Çawa ku ji serdema ekola ewil a ilmê kelam Mu'tezîle ve ʻeqîde û felsefe derketine hemberî hev, heta sedsala bîstî vê dijberîyê di navbera van her du ilman de her berdewam kirîye. ʻEqîdenamenûsên Kurd, ji ekolên Ehlê Sunnetê, li ser bingeha fikra dibistana "Mezhebê Eşʻerî" berhemên xwe dane.

*Şerhu'l-ʻEqaid*a Sadeddîn et-Teftazanî (w. 792/1390), *ʻEqîdeya Tehawî* û şerha wê ya ku ji alîyê Muhemmed b. Muhemmed el-Babirtî (w. 786k) hatîye kirin, *Haşîyetu Kestelî ʻEla Şerhi'l-ʻEqaid* a Muslihuddîn Mustefa el-Kestelî (1315h.), *el-Cewheru'l-Kelamîyye* ya Şeyx Tahir bin Salih el-Cezairî (h. 1268-1338), *Kubre'l-Yeqînîyati'l-Kewnîyyeti* ya Muhemmed Seîd Remezan el-Botî (1924-2015), di medreseyên Kurdan de, wek kitêbên Erebî yên dersa kelam û ʻeqîdeyê cih girtine.

Alimên Kurmanc, Goran, Soran û Kirmancan/Zazayan, berhemên xwe yên ku di warê ilmê kelamê de nivîsîne, bi navê "ʻEqîdeya Îmanê" bi nav kirine. Piranîya ʻeqîdeyên bi zimanê Kurdî bi awayê menzûm hatine nivîsîn; lê yên bi awayên pexşanî hatine nivîsîn jî ne hindik in.

Qismek ji komên ʻeqîdenameyan, li ser mijarên ulûhîyetê hatine nivîsîn ku ev cure berhem, bi navê *Munacat* û *Tewhîd*ê tên binavkirin.

Amanca aliman bi nivîsîna ʻeqîdenameyan, her piştgirîya ʻeqîdeya Îslamê bûye û ew, wek parêzvanên sefa pêşî ya keleha dîn, beşdarî hewla berevanîya ʻeqîdeyê bûne.

Alimên medreseyî yên Kurdan ku hema hema di hemû şaxên ilmên esasî yên Îslamê yên mîna Hedîs, Tefsîr û Fiqhê de berhem dane; bes herî zêde di warê ilmê ʻeqîdeyê de kitêb nivîsîne. Piranîya nivîskarên ʻeqîdenameyên Kurdî, çawa ku bi zimanê Kurdî ʻeqîde nivîsîne, bi zimanê Erebî jî nivîsîne. Çawa ku van aliman ji berî xwe ve berhemên edebî yên ʻeqîdeyî, bi zimanê xwe nivîsîne, wan her wisa "şerh"a berhemên berî xwe jî kirine û hinek berhem jî ji zimanê Erebî wergerandine zimanê Kurdî. Berhemên ʻeqîdeya îmanê ku bi Goranî, Kurmancî, Soranî û Kirmanckî hatine nivîsîn, di bin bandora îtîqada Eşʻerî de mane.

Sedemeke mezin a ku alimên medreseyên Kurdan berê bal û dêhna xwe zêde dane ser *Kullîyata Risaleyên Nûr* û gelekan ji wan qesîde û mersîye li ser Bedîuzzeman nivîsîne ew e ku ev berhem, li hember fikrên dijberî ʻeqîdeya Îslamê, bi metodolojîya modern ketine berevanîyê û wan, pêşîya hiş û fikra aliman vekirîye.

Hema hema hemû ʿeqîdenameyên Kurdî, bi teşeyê nezmî yê mesnewîyê hatine nivîsîn, yekeyên wan ên nezmî "beyt" ango "malik" in û babetên ʿeqîdenameyan, digel her pênc ruknên Îslamê, her şeş ruknê îmanê ne.

Çawa ku ʿeqîdenameyên Kurdî her şeş ruknên îmanê girtine dêst, hinekan ji wan, tenê ruknekî îmanê ji xwe re kirîye mijar.

Pirtirînê ʿeqîdenameyan bi Kurmancî, peyre hejmareke wan bi Kirmanckî hatine nivîsîn.

## 13. ÇAVKANÎ


Acar, Hayrullah (2016). "Fiqihnameyeke Menzûm Di Edebîyata Kurdî De: Rîsaletu Sefînetu'l-Ekrad Îla Sebîli'r-Reşad/ Sefîna Kurdan Ji Bo Ehlê Bajar û Gundan a Mela Ebdulcelîlê Botî" *e-Şarkîyat ilmi Araştirmala Dergisi*, Nîsan c. 8, j. 1. (25) www.esarkiyat.com

Adak, Abdurrahman (2010). "Mela Xelîlê Sêrtî: Helbestvanî Bi Mexlesa "Şewqî" û Helbestên Wî yên Kurd (Kurmancî)", İstanbul: *Mukaddime*, j. 1.

Adak, Abdurrahman (2013). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Adak, Abdurrahman (2015). "Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de Cureyeke Edebî: Zanistên Îslamî" İstanbul: *Nûbihar*, j. 132.

Ahmad, Hêmin Omar (2016). "Mehwî Dîwana Wî û Helbesteke Wî", İstanbul: *Nûpelda*, j. 23.

Ahmad, Hêmin Omar (2016). "Danasîna Dîwana Mehwî", İstanbul: *Bingöl Ünv. Yayşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, j. 4.

Amedî, Seyfeddîn Ebî'l Hesen ʿElî bin Ebî ʿElî bin Muhemmed (1405/1980). *el-Îhkamu Fî usûli'l-Ehkam*, (Debetehu we ketebe Hewaşîye eş-Şeyx Îbrahîmu'l-ʿEcûz), Beyrût: Daru'l Kutubu'l Ilmîyye.

Amedî, Zeynelabidîn (?). *Erbeʿeu Menzûmatin*, Dîyarbekir: Metbeetu Dîyarbekirsoz.

Arif, Muhemmed Nûrî (1981). *Tekstî Edebî Kurdî*, Bexda: Çapxaney Zankoy Silêmanî-el-Mektebetu'l-Wetenîyyeti.

Büyükkara, Mehmed Ali (2013). "Çağdaş İslami Akımlar", *İslam Mezhepler Tarihi*, Eskişehir: Anadolu Üniv. Yayını.

*Büyük Larousse Sözlük ve Ansiklopedi*, Millîyet Gazetecilik A. Ş., 1986, c. 1., r. 274.

Beyazîdî Şêx Yûsuf (2008). *Tuhfetu's-Subyan*, İstanbul: Nûbihar Yayınları.

Botî, Muhemmed Seîd Remezan (1394/1974). *Kubre'l-Yeqînîyyati'l-Kewnîyyati,* Dimeşq: Daru'l-Fikir.

Cezairî, Şeyx Tahir bin Salih (1434/2013). *el-Cewheru'l-Kelamîyye*, (Heqqeqehu: Mela Ebdusselam el-Bêcirmanî), İstanbul: Daru'r-Rewdetu.

Cezairî, Ellame Tahir (bê drk.) *Cewhera ‘eqîdeya Îslamê*, (Ji Erebi: Abdusselam Bêcirmanî û Muhemmed Bêrkevanî), İstanbul: Peyxam Yayınları.

Çiftçi, Metin (2015). *Eqîdenameyo Zazakî yê Mela Mehemedê Hezanîyî*, Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstîtüsü, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi (tez yök.pdf)

Dîyarbekirî, Ehmed Hilmî Qoxî (2004). *Gulzara Hemûka Şerha Nûbihara Biçûka*, İstanbul: İhsan Yayınları.

Dîyarbekirî, Mela Ehmed Hilmî Qoxî (2014). *Kitabu Rehberi Sanî Şerha Eqîda Şeyx Ehmed bin Ilyas el-Xanî*, İstanbul: (?)

*Dîwana Heyderî*, (2012). İstanbul: (amd. M. Dîyaeddîn Heyderî), Nûbihar.

*Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*, (2016). İstanbul: (Metn û Lêkolîn: Hayrullah Acar), Nûbihar.

Emin, Muhemmed (?) *Eqîda Îmanê*, İstanbul: Ayfa Basın.

Esîn, Salih bin Ebdurrehman (1434). *Şerhu’l-’eqîdeti’t-Tehawîyye*, İstanbul: el-Xureba.

‘Ebdulhemîd, Muhemmed Muhyeddîn (2014). *et-Tuhfetu’s-Senîyye bi Şerhi’l Muqeddimeti’l Acûrrûmî*, Beyrût: Mektebetu Daru’l Fecir.

‘Ebdullah Rûbîn Huseyn, (2012/1434). *Mu’cemu’-Nefaisi’l-Esasî*, (Îşraf: Ehmed Ratib ‘Ermûş), Beyrût: Daru’n-Nefais.

*‘Eqîdenameyên Kurmancî*, (2011). Hewlêr: Çapxaney Hacî Haşim.

‘Eqîl, Behaeddîn ‘Ebdullah bin ‘Ebdurrehamn bin ‘Ebdullah bin (1432/2015). *Şerhu Îbn ‘Eqîl ‘Ela Îbni Malik,* (Te’lîfu’l –‘Ellametu Muhemmed Muhyeddîn ‘Ebdu’l-Hemîd), Beyrût: Merkezu’r-Risaleti lid-Diraseti we Tehqîqi’t-Turas.

Farqînî, Zana (2000). *Büyük Türkçe Kürtçe Sözlük*, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî.

Gazzalî, Ebû Hamid (2000). *Tehafütü’l-Felasife –Filozofların Tutarsızlığı*, (Eleştirmeli Metin Çeviri: Mahmut Kaya-Hüseyin Sarıoğlu), İstanbul: Klasik Yayınları.

Geçer, Husnî Hezîn (2007). *Rîsaleên ‘Eqîde û Exlaq û Edebê*, amd. Ebdusselam Bêcirmanî, İstanbul: Nûbihar.

Gölcük, Şerafettin (2012). *Kelam Tarihi*, Konya: Esra Yayınları.

Güneş, Kamil (2014). “İlk Dönem Kelami Şahsîyetler” *Kelama Giriş*, Eskişehir: Anadolu Ünv. Yayını.

Haşîyetu’l-Kestelî ‘Elî (1315). *Şerhu’l-Eqaidi*, İstanbul: Salah Bilici Kitabevi.

Heyderî, Şêx Muhemmed Emîn (2007). *Mewlûda Nebî*, Amed: Lis Basın Yayın Pazarlama.

Hezroyî, Mela ‘Ebdulfettahê (2012). *Dîwana Fethî*, (Berhevkirin: Tehsîn Îbrahî Doskî), İstanbul: Nûbihar.

Hêvîdar, M. Êhsan (2009). “Bi Seydayê Mela Seîdê Taxikî re li Ser Xebat û Jîyana Wî” *Nûbihar*, İstanbul, j. 107.

Hızlı, Mefail (2013). “Eğitim-Öğretim Kurumları” *İslam Kurumları ve Medenîyeti*, Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayını.

Hûnî, Mele Mehemed Elî (2004). *Mewlid,* İstanbul: Weşanxaney Vateyî.

ilmî-Zîla, Seyda Mela ʻElî (2012). *Dîwan, Jîyan û Berhem*, (Amadekar: Necatê Zivingî), İstanbul: Banga Heq.

Isfehanî, ebî'l-Qasim el-Huseyn b. Muhemmed er-Raxib (2005/1426), *el-Mufred fî Xerîbi'l-Qur'an,* Beyrût: Daru'l-Me'rife.

Kılavuz, Ulvi Murat (2014). "Kelam Eserleri", *Kelama Giriş*, Eskişehir: Anadolu Ünv. Yayını.

*Kitabu Buşre'l-ʻIbad fî ilmi'l-Iʻitiqad*, (Destxet: Zeynelabidîn Amedî) Dîyarbekir: el-Mektebetu'l-Islamîyyeti.

Kestelî, Muslihuddîn Mustefa, (1315h.). *Haşîyetu Kestelî ʻEla Şerhi'l-ʻEqaid*, İstanbul: Salah Bilici Kitabevi.

Koçer, Feqe Reşîdê (2002). *Siru'l-Mehşer*, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Mecmuʻetu Min Erbeʻeti Kutubin (1433/2012). "Sebîlu's-Selami Fî ʻeqîdeti'l Enami", (Amadekar: Mela Ebdusselam Bêcirmanî) İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar.

Mêrgî, Şêx Ebdurrehman el-Farûqî el-Botî (2013). *el-ʻEqîdetu'l-Kurdîyye*, amd. Muhemmed Muxlis b. Şêx Ebdurrehamn İstanbul: Nûbihar.

Nacim, Abdurrahman (1881). "Ulema ve Kurd Ahalisi", *Tercuman-i Hakikat*, j. 982.

Nacîm, Abdurrehman (1285). *Sefwetu'l-Kelam*, İstanbul: Metbeetu ʻAmire.

Neqşebendî, Ebdullah Îbn Mehmûd (1379/1960). *Îrşadu'l-Îbad min ʻEwami'l-Mu'minîn,* (cî û weşanxane ne dîyar e).

Nesefî, ʻUmer (1315). *Metnu'l-ʻEqaidi li ʻUmeri'n-Nesefî*, İstanbul: Salah Bilici Kitabevi.

Erdemci, Cemaleddin (2014). "Ehl-i Sünnet Kelamı" *Kelama Giriş*, Eskişehir: Anadolu Ünv. Yayını.

Nûrsî, Bedîuzzeman Seîd (2002). *Barla Lahîkasi*, İstanbul: Zehra Yayıncılık.

Özler, Mevlüt (2014). "Tarif, İsim ve Kapsam" *Kelama Giriş*, Eskişehir: Anadolu Ünv. Yayını, Eskişehir.

Öztürk, Ali (2013). "Dinî Tür ve Konular", *Türk İslam Edebîyatı*, Ankara: Anadolu Ünv. Yayını.

Qedrî, Mamoste (2008). "Tehlîla Berhemên Xanî Ji Alîyê Şêwaz û Naverokê Ve, Nûbehara Biçûkan û ʻEqîdeya Îmanê", *Sempozyuma Ehmedê Xanî ya Navneteweyî* İstanbul: Weşanên Şaredarîya Bajarê Mezin a Dîyarbekirê.

Qeredaş, Ce'fer (2015). *el-Muxteser fî Tarîxi ilmi'l-Kelam we'n-Nusûsi'l-Kelamîyye*, İstanbul: Ensar Neşrîyat.

Receb, Şeyx Bekrî (1994/1414). *Hidayetu'l-Murîd îla Cewhereti't-Tewhîd*, Tehqîq. Muhemmed Wehbî Suleyman&Hezim Muhyedddîn, Beyrût: Darulxeyr.

Seîd, Mela (1998). "Mezhebên Nehwê û Kitêbên Xwendinê", İstanbul: *Nûbihar*, j. 63-64.

Selasu Menzûmatin, Cemeehu Zeynelabidîn Amedî, Metbeetu Dîyarbekirsoz. Dîyarbekir, ?)

Sêrtî, Mela Xelîl, (1327). *Nehcu'l-Enam*, (Herrerhu Mustefa Helîm), Metbeetu Ewqafi Îslamîyye we Eskerîyye.

Şafiî, Hesen Mehmûd (2001). *el-Medxelu ila Diraseti ilmi'l-Kelam* , Karanşî: Îdaretu'l-Qur'ani we 'Ulûmi'l-Îslamîyye.

Şemrexî, Ebdirrehîm lawê Ebdulkerîm (bê dîrok e) *Gulzar*, Dîyarbekir: Mektebetu Seyda.

Taşkın, Hanefi (2016). "Mela Haşimê Miksî û Dîtina Terîqu'n-Necata Wî", *Nûbihar*, Payîz Stenbol, j. 137.

Tewerzî, Edîb (2009). "Seydayê Mele Xalidê Zengokî û Berhema Wî ya Murşidu't-Talibîn" *Nûbihar*, İstanbul, Bihar, j. 107.

Tuhfeti'l-Elaîyyeti fî Ulûmi'ş-Şer'îyyeti bi'l-Luxeti'l-Kurdîyyeti el-Lehcetu'l-Kurmancîyyeti, (Naşir: Muhemmed Nûrî Nas), Estel: (Weşanxane nenivîsandî ye).

Veroj, Seîd (2017). *Abdurrahman Nacim*, İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları.

Xanî, Ehmedê (2008). *'eqîdeya Îmanê*, Analiz ve Şerh: Kadri Yıldırım, İstanbul: Avesta.

Xezzalî (2009/1430). el-Îqtisadu fî'l-Îtîqad, Muheqqiq: Mustefa 'Umran, Qahire: Daru'l-Besair.

Xezzalî, El-Huccetu'l-Islam el-Îmami (1405/1985). *Qewaidu'l-'Eqaid*, (Tehqîq we Te'lîq: Mûsa Muhemmed 'Elî), Beyrût: Alemu'l-Kutub.

Yıldız, Alim (2013). "Alla Teala ile İlgili Edebi Türler", *Türk İslam Edebîyatı*, Ankara: Anadolu Ünv. Yayını.

## Extended Abstract

The literary works on the pillars of faith in Islamic religion are called "Akidename". There many works of this kind in Kurdish literature as well as Arabic, Persian, and Turkish literature. The first akidename was written in the Kurmanci dialect of the Kurdish language. Ahmedé Xani wrote this work in masnavi verses format with the title of "Eqideya İmané" in the 17th century After this work, which was used as a course book in the Kurdish madrasa for centuries, Mela Xelilé Serti (Death, 1843) partly continued this tradition with his poem titled "Nehcu'l-Enam". After Sérti, Mela Nesrediné Zoqeydi (1927), Ewdirehim Rehmîyé Hekari (1916), Mela Abdulfettahé Hezroyi (Death, 1975), Şéx Musayé Merdini, Mela Mıheme Hizani (1983) and Mela Ebdulhadîyé Comanîyi are some of the poets of this kind. There are also proses apart from these poems. Xelife Yusufé Bayezidi's (Death, 1387/1968) Eqidetül-İman, is the most famous one among them and was published in Dımeşq/Damascus in 1326/1908. In addition to the Kurmanci dialect, the Akidenames written in Gorani, Sorani, and Zaza languages adhered to this tradition. Mewlewi (Hijri

1300) wrote akidenames in Gorani, Mehwi (1831-1906) wrote in Sorani, and Mela Mihemed Huni (1970) wrote in Zaza.

The Akidenames are considered to be a sub-type of the Kalam, which is regarded as one of the basic Islamic sciences, and associated with fiqh. The Islamic akide faced various philosophical opposite ideas since the era of the Companions, it has tried to maintain the original form of faith against them and various works have been written in this field. Especially after the Renaissance in Europe, the exploration and philosophical mobility has forced Islamic faith as well as the Christian akide. The Kurdish scholars have preferred to offer works in the field of akide with a new style of thinking against this new intellectual movements. While some of them were the explanations and inscriptions written on the classical works, the others were rewritten. Some works were written only about Faith in Allah -such as Feqe reşide Koçer's Sirru'l-Mahşer- others studied all principles of faith.

Besides them, there were also those who translated the works written in Arabic into Kurdish. Besides Arabic, we see that some works from the Risale-i Nur Collection, the great majority of which examines the basic references for the Islamic faith, have been translated into Kurmanci, Sorani, and Zaza language. According to the current figures in general, the numbers of akides written in Kurmanci, Sorani, Gorani, and Zaza languages are 18, 1, 1, and 3 respectively.